


OROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



21
—
1988

NAVEROK

Jî Xwendevanan.....	3
Kurdên Tîrkiyê : Neheqi û Teror — R.KRISTEV.....	4
15 Saliya Dr. Nuri DERSİMİ.....	6
Daxuyani-TEVGER.....	8
HESKİF dî bin avê da dîmine, BARAN.....	10
Çend Çarîn.....	13
Tenê welat dîkare merîv bextewar ke.....	14
Jî Gernama Ewliya ÇELEBÎ.....	16
Komcivina KOMKAR'ê ya 10'an.....	20
Mesaja İsmail BEŞİKÇİ.....	21
Navê Aziz NESİN ji kete lista "Parvekanan"	22
Piyes.....	24
Quncikê Zarokan.....	28
Helbest-Cegerxwin sax e.....	30
Weşanên Nû.....	31

Sal: 10
Hejmar 64, İlön 1988

XWEDİ : KOMKAR - Swèd
BERPIRSİYAR : Şêroyç BOTAN
NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGIVARE : S. BOTAN
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

JI XWENDEVANAN

Ji perpirsiyarêñ Roja Nû ra:

Hevalên delal, wek hûn ji baş dizanın neyarêñ me, wek hemû mafêñ gelê me, pêşdaçûna bêje û zimanê kurdi yê niviski ji naxwazin bibinin. Bi rasti "Roja Nû" bî kurmanciyeke zelal, vekiri û xizneke peyvan ku baş dewlemend e tê nivisin. Ev yeka ji bona bêjeya me û pêşdabırına zimanê niviski pir hêja û pêwist e.

Hemû zaneyêñ kurd û hevalên kurdan dibinin, ku hûn xwe ji her hawi de, ji bona kovareke spehi û dewlemend biweşinîn dihelkinin. Ez dikarim bî serbilindi bibêjim ku hûn gihane vê armancê.

Erê, "Roja Nû" di nav dûlê gelê kurd û hevalên wi da ci-hê xwe yê hezkuri û germ digire...

Min perê abonetiyê şand ez hêvidar im hûn kovare her timi ji min re bisinîn. Spas ji we hevalên delal re !

Bî slavêñ birati û şoreşgeri

*Nurnberg
Azad FESIH*



WELATÊ ME

*Welatê me Kurdistan e
Dagirti ye bin destan e
Hêla xelkê bîhar havin
Tim ji me ra zivistan e
Herre lao xelki rezilo
Tu neçaro tu sefilo*

*Dêrsim ji Meletyê wê da
Her newalek çend tîrb tê da
Hûr û giran qırşûn xwarin
Êdi rîzin bin erdê da
Herre lao xelki rezilo
Tu neçaro tu sefilo*

*Çar xwinxwaran par kirine
Jî heqê wan kar kirine
Xeber tê vi ali dînyê
Herro hêlek ar kirine
Herre lao xelki rezilo
Tu neçaro tu sefilo*

FEDAYI

Ji endamên ROJA NÛ ra

Beri her tiştî pir silavêñ germ ê welat li we teva dikim û paşı ji ez, pir silavêñ giranbuha yê şoreşgeri ji we hemû hevalan ra pêşkêş dikim. Zor spasiya we teva dikim ji bo kareki usa hêja. Ez ji we ra hertim pêşketin, serkevtin û serfirazi daxwaz dikim.

Birayêñ hêja, ez bî xwe kurdeki ji Kurdistan Bakûr im (Kurdistana Tirkîyê). Eva qede-reke ku min ji welat xwe gîhandiye Yekitiya Sovyet û ez niha li vir diminim. Çawa tev dîzanın li Yekitiya Sovyet Kurd pir in. Wana çend hejmarêñ Roja Nû dane min lê gava min rûpelê kovarê qiliband, bê hemdê min hêstir ji çavan niqitin ser rûpelê kovarê. Belam li welat ew dijminên nijadperest, xwinmij nahêlin em bî zimanê dayka xwe ê şêrin bixwinin û bini-visin. Lê min ew kovarana birin mal û min xwend, xwend û cardin xwend, cardin... Usa ku her kovarekê pênc - şes cara lê vege riyanam. Usa zimanê şêrin li min xweş dihat, te digo qey ez kasa jiyânê vedixum.

Hevalno, daxwaziyeke min ji we heye ku, hûn her hejmareke Roja Nû ji min ra bisinîn. È kevn ê nû be ji tişt nabe da ku ez, zimanê dayka xwe û pêra ji çanda gelê xwe rind fêr bîbim. Emê wan perdîn reş yêñ ku nijadperesta daniye eniya çavê me bigelêşin û emê bigihîjin ronahiyê.

Cardin zor spasiya we teva dikim û ji gel ra pêşketin daxwaz dikim. Pêşketin her ji bo gelên bindest ra!..

Bimre nijadperesti!


Biji têkoşina gelê Kurdistan!

*Yekitiya Sovyet, 07.07.1988
Serbest WELAT*

Li Ser Kurdan Kitêbek Nu:

”KURDÊN TIRKIYÊ : NEHEQI Û TEROR”

Li Bulgaria rojnamevan Radoy KRISTEV bî vi navi kitêbek derxist. Kitêb ji çend biran pêk tê. Bi kurti li ser diroka Kurdan a berê disekine û xasima bûyerên piştî Şerê Cihanê 1. û li ser rewşa dawi disekine. Me pêşgötina vê kitêbê wergerande Kurdi û li jêr pêşkêşi xwendevanan dikin.



Kurd, bî rasti, yek ji gelên Rojhilata Navin yên heri kevn in. Ew bineciye vi welati yê kevn in û dî sedsalêن II - VII da saziya xwe ya Kurd wek civateke etniki pêk anine. Ew zmaneki Hindi-Ewrûpi qise dikin ku ji beşa İrani ye. Zmanê wan dî sedsalêن VI - VII da wek zmaneki xweser dîghê û xwe nişan dide.

Zanina me dî derheqa firehiya erdê Kurdistanê di navbera 410.000 û 515.000 km² da dîguhure. Tenê firehiya Kurdistana Türkiyê 220.735 km² ye ku ji sedi 29,9'ê Türkiyê pêk tine.

Kurdistana Türkiyê ku ji 18 wilayetan pêk tê, xelkê xwe bî pirani Kurd e. Ew wilayet Gridax, Adiyaman, Bingol, Bitlis, Van, Diyarbekir, Xarpit (Elaziz), Erzurum, Erzingan, Enatab, Qers, Meletye, Mêrdin, Mûş, Ruha, Sêrt,

Dêrsim (Tunceli) û Çolemêrg (Hekkari) ne.

Dî sedsala XV da Kurdistan di nav sinorêne dewleta Faris (Pers) da bû. Dî sala 1914 da Kurdistan di navbera du imparatoriyan da -Osmani û Faris- bû du parça.

Wi zemani gelên dî bin bandûra İmparatoriya Osmani bî aliye abori, cîvaki û çandi ji Tîrkan gelek pêşva bûn û rewşa hanê heya destpêka sedsala XIX dom kir. Türk di dawîya sedsalê XV û nivê pêşini sedsalê XVI da wek geleki çêbûn. Bona vê yekê ji ew li ser Kurdan bê tesir bûn.

Piştî Şerê Cihanê ya I. dî navbera Türkiyê, Iraq, Iran û Sûriyê da bû çar parça.

Jî ber astengênu ku hukma Türk derdixe pêş merivan, gelek zehmet e ku meriv hejmara Kurdên Türkiyê çiye, rasterast hin be. Ew, vi

hejmari, çıqa ji dest hat, kêm nişan dıdim.

Gora Salnama Statistikên Turkiyê ya 1964-1965 (rûpel 77, 93) hejmara kesen ku li Turkiyê Kurdi qise dikin usa ye:

Sal	Yên ku Kurdi qise dikin (bî hezari)	
	Wek zmanê dê	Wek zmanê duduyan
1955	1680	681
1960	1848	712
1965	2328	

Kurdên li der Kurdistanê (li ali dinê Turkiyê) li vir ne hatine nişandan. Dîgel vê, pîr kes ji tîrsa zordestiya dewletê Kurdiya xwe veşartine. Disa ji, ger lêkolinek baş bê kîrin, xuya dibe ku dî sedsala XX, salê 80 da hejmara Kurdan bî tevayı 20 milyoni derbas dibe. Ji zêtiri sedi 85'ê wan li Kurdistanê dijin ku ew sedi da 24'ê tevayıya nufusa Turkiyê pîk tinin. Hejmarê Kurdan belki hin ji zêtir e.

Çend zaravayê (diyalekt) zmanê Kurdi heye. Bingeha wan coxrafi ye: Kurdiya Bakûr, ya Navbendi û ya Başûr. Kurdên Turkiyê zaravayên Kurmancî û Zazaki, ango beşa Kurdiya Bakûr qise dikin. Gora istatistikên resmi yên Turkiyê, ya sala 1965, li Turkiyê 2 180 721 kes Kurmancî, 147707 kes ji Zazaki qise dikirine. Disa gora van statistikên resmi, xelkê ku li Rojhilata Feratê diji, sedi da 65 Kurdi qise dike.

Weki li Ruhayê, Diyarbekrê û Gridaxê hejmara kesê ku Turki nîzanın sedi da 60 - 70 ye, ev hejmar li sîrt û Hakkariyê dibe sedi da 85 - 90.

Dî sala 1970 da sedi da 77'yi Kurdan xwendin û nîvisandun ne dîzanı bû (sedî da 64 mîr; 91 ji); niha ev reqem büye sedi da 40.

Kurdistana Turkiyê ji aliyê heyiyên bînerd gelek dewlemend e, weki hesin, krom, sıfar û hwd.. Temamiya xezneyên nifta Turkiyê li Kurdistanê ye. Weki dî sala 1950 da 18 000 ton nifta xam dihat derxîstîn, dî sala 1975 da ev giha 3 150 000 ton. (Dî sala 1980 da hewcedariya Turkiyê bî niftê, salê da 14 milyon ton e.)

Kurdistan ji aliyê ava herikok ji gelek dewlemend e. Ew ji elatrika ku Turkiye bî dest dî-

xe kîfş dibe. Lî Turkiyê hêza elatrikê 16 518 458 KW e. Jî vê 6 188 710 KW ji Ferat, 1 518 235 KW ji ji Dicle çê dibe.

Himber ewqas dewlemendi ji ci û warêne Kurdan ciyên heri şundamayı ne li Turkiyê. Ev ji siyaseta dewleta Türk pîk tê ku tim diji gelê Kurd e. Lî Turkiyê dî navbera salê 1935 û 1965 da dereca pêşveçûnê 16,4 û 28,3 (bo hezar kesi); lê ev hejmar li Kurdistanê 9,3 û 17,2 bû

Dî sala 1969'an da para sermiyanê ku şirketên şexsi li Kurdistanê datanın tenê sedi da 1,93 bû.

Weki sedi da 19,8'ê saziyên senayiyê tenê li bajarê Stembolê ye, lê li Hakkariyê sedi da 0,09 e.

Lî Kurdistanê sedi da 72'ye gel bî cotkari mijûl dibe. Lî Turkiyê ji temamiya makînên çandîniyê tenê sedi da 3 li kurdistanê ye. Lê ji temamiya erebêñ ga û hespan sedi da 39 li Kurdistanê ye. Bî aliyê dezgeyê ekonomik pêwendiyên fêodali, eşirti û malbatî hin berdewam e. Jî sedi 16,6 kes xwedîyê sedi da 77' ê tevayıya erdê ye, lê himber vê ji, sedi da 38 kes bê erd e.

Pêşveçûna kapitalizma Turkiyê, xasîma li Kurdistanâ Turkiyê ne bî rengeki klasiki ye, ew bî şikleki nîvfêodal e. Bona vê yekê li Kurdistanâ Turkiyê sınıfa bûrjûwa ji aliyê çêbûnê hin ne giha ye.


Kurdistana Turkiyê bî aliyê eskeri ji qimetek xwe ya stratejik heye. Pîsti ku DYB (Dewletên Yekbûyi yê Amérîkê) li Rojhilata Nêzik û Navin da bî ci bû û ew der ji bo mafêñ xwe wek ciyekî jiyanî ilan kir (sedi da 69'ê xezneyên niftê li vê mintiqê ye), ew qimet hin zêtir bû.

Bî riya Kurdistanâ Turkiyê sinorê NATO û SSCB dî reşayiyê da rasterast dîghê hev.DYA, agahdariyê ku derheqa SSCB bî riya keştiyên Kozmos bî dest dixe, sedi da 30 ji ser Turkiyê distine. Eger merîv bîne bîra xwe ku piraniya van bingehêñ eskeri li Kurdistanâ Turkiyê ye û bingehêñ DYB ên eskeri li İranê hatine girtin, hingê Kurdistan bî aliyê strateji zêtir granbuha dibe. Bona vê yekê ye ku niha 1 Kurdistanê balafirgehêñ nu û nûjentir têñ avakîrm.

DYA li Kurdistanê siyaseteke diji Kurd bî rîva dibe.

Werger: DARA

Dr. Nûri Dersimi



Îsal 15 saliya mîrina ronakbir û welatparêzê Kurd Dr. Nuri Dersimi ye...

Bî vê munasebetê em dixwazin ku wi bî bir binin. Jî ber xebat û têkoşina wi ya welatparêz ev yeka heqe ji...

Çawa ji navê wi ji tê zanin, ew ji hêla Dersimê bû. Dersim bî sedan sal bû ku aza û serbi-xwe dijiya û dijmin nîkaribûn biketana erdê Dersimê. Dijmin pîr caran ceriband, lê nedikariya ku vê navça Kurdistanê bixe bin destê xwe û gelê wê dil û bindest bike.

Gel bî ziman û çanda xwe, bî kîlam û govenda xwe, li gora daxwaza dilê xwe dijiya.

Nuri Dersimi ji dî van hoyêن azad da ji dayik bû û xortaniya xwe di vê hewayê da derbaz kir. Dersimi dî şin û şahiyan da, şer û cîvatan da besar bû. Ramanênetewi, ziman û kultura kurdi ew rind zeft kir. Havêne welatparêziya xwe dî welatê xwe da, dî nav gelê xwe da girt...

Dersimi 1911'an da xwendîna navin (lise) qedand û berê xwe da İstembolê. Lî wir, dî mekteba Beytariyê da qeyd dibe.

Dî wê demê da, dî welatê Osmaniyan da guherandimên mezîn hene. Jontûk hatine ser hukum. Jî ber baweriyêñ xwe yên nijadperest, gel dehfi şer dikin. Bajarê İstembolê jî ali politik da dîkele, gelek millet û hûrgelêñ nav dewleta Osmani da, ji bo mafêñ netewi û kulturi hewl didim û xebat dikin. Ew tişt li ser xwendevan û ronakbirêñ Kurd ji tesirê dike...

Xwendevan û ronakbirêñ Kurd, bî navê "Kurd Teali Cemiyeti" cemiyetek pêk anîbûn.

Dersimi, dî wextekî kîn da bû endamê cemiyetê û dî xebatê da cihê xwe girt.

Aliki da mekteba beytariyê dixwendî aliki ji dî kar û barê cemiyetê da besar dibû. Rewş û xebata li İstembolê welatparêziya wi şîdand û xurttir kir.

Dî destpêka Şerê Cihanê 1. da ew girtine eskeriyê û şandin Erzinganê.

Dersimi, dî şer da rewşa Kurdistanê ya nazik dit. Telef û surguna gel û serûbinbûna Kurdistanê dit, pê dîlêş bû. Bî dîzi li diji şer dînay eşiran da propaganda dikir. Jî têkiliyêñ wi yên bî gel ra komutanen Osmaniyan aciz dibûn û wi dışının Sêwasê.. piştra ji Girasunê...

Dî sala 1917 (meha Tebaxê) terxis dibe û vedigere İstembolê. Pişti salekê mekteba beytariyê dîqedine. Bî bîryara Cemiyeta Kurd Teali, tayina xwe derdixe Sêwasê. Dî 1919'an da dest bî Veterineriya navça Dîrigi, Zara û Kangalê dîke.

Alişan Beg - Alişêr û Dersimi li gor armanca cemiyetê dixebitin û gelek ciyan da şubeyen cemiyeti damezrandin. Dî nav eşiran da ji bo ku neyarti, dubendi bêne kevandin, kûr nebin li hember dijmin yek bibin pîr cehd kîrin.

M.Kemal ji xebata Kurdan hêrs dibû.. Lî qeza Koçhisarê çîftlik da Dersimi û sozê mebûsiyê ji serda. Ü xwest ku ew xebata welatperweriyê cih bîhêle û wi bikirin...

Lê Dersimi, tu caran qimet nedîda malê dinê. Wi rind dizaniya ku kesen ku xwedi welatnin nîkarin bibin xwedi çîftlik û mal ji. Dî bin destê dijmin da xwedi malbûn her wext bê balbûn e...

Dersimi dî şerê Koçgiriye da çi jê hat kir. Bî xwe piştgiriya gelê Kurd kir. Dî navbera cemiyetê da, dî navbera heyetê dewletê û serokeşiran da dixebiti...

Lê pîr mixabin ku hêzên dijmin, ew serhildana han bî xwinê vemîrand. Bî hezaran zar û kal, jîn û mîr hatin kuştin. Laweki Dersimi ji

bî navê Ali, bî vi şeri da tevi şehidan bû.

Bî destê komandare Turk -Nureddin Paşa, Koçgiri hate wêrankirin. Mehkema kolonyalistan derheqê Alişêr, Dersimi û 108 kesên din, bîryara idamê dan. Lê Alişêr, Dersimi û pêşewayê eskeri Mahmut Beg û hin şervanê din neketine destê dijmin û di 15'ê Gulânê 1921'i da xwe gihandin Dersimê.

Servanê ku jî Koçgiriyyê hatibûn, bî Seyid Rıza ra civiyan, li ser rewşa Koçgiriyyê û girtiyan peyivin û li çaran geriyan.

Seyid Rıza bî daxwaznameki (dilekçe) kırinê hukumeta Türk li Koçgiriyyê, protesto kîr û daxwaza berdana girtiyêن ku di dadgehêن eskeri da mehkeme dibûn kîr.

Di wexteki kurt da girti hatine berdan û efûkirin, xeyni Dersimi û Alişêr. Jî ber vê ye-kê herdu welatparêz di Dersimê da bî cih bûn û bûne hevalê Seyid Rıza yên nêz.

Piştî serhildana Şêx Seid, zulm û surgun li ser Kurdan domkir. Hukumeta Enquerê, Dersim girtibû rojevê. Jî ber vê li behanan digerian... Dixwestin ku Alişêr û Dersimi teslim bîbin.

Rojekê waliyê Diyarbekir çû Dersimê û S.Rıza dit. Xwest ku S.Rıza û Dersimi ji Dersimê derkevin. Armanca dijmin aşkera bû. Dixwestin ku gel jî serok û kadroyêن xwe yên zana mehrûm bihêlin. S.Rıza, jî bo xwe ew tişt qebûl nekir, lê jî bo N.Dersimi qebûl kîr (wek taktik). Lî bajarê Elazîzê, çîftlikâ Holvenkê danê. Seyid Rıza dixwest ku 'Dersimi, di Elazîzê da bîmine, jî ber ku wê Dersimi ji tevgera Dersimê ra bêtir bî kîr bîhata.

N.Dersimi pêwendiyêن xwe bî S.Rıza ra di-domand. Û dijmin pê baweri nedikir. Careki Dersimi, bî navê "xîyaneti" û "cîhêxwazi" ke-tibû lista polis.

Pir caran davêtin ser mala wi û ew taqip dikirin. Gelek dostêni wi yên berê, rûyê xwe jê guhaştin.

Hukumetê dixwest ku bî darê zorê û bî malê dinê wi bî xwe va girêde. Lê wi ev ser-nizmiya tu wexteki qebûl nekir, û di hemû kar û barê xwe da bî hevalêن xwe şêwiri.

Gelek caran tê girtin, jî ali amîr û komandaren Türk va tê tehditkirin. Dersimi bî rîk di berxwe dîde, jî doza xwe ra ixanet nake û bî tu menfaeti ra nayê girêdan.

Keminêni ku Mistefa Kemal li hember se-rokeşiran datani wek mebûsi, erazi, çîftlik û yên din... Dersimi tu wexteki baweriya xwe pê neaniye, bî meqam û peran nehatiye xapan-

dîn. Hertim baweriya Kurd û Kurdistanê, ser menfaetê şexsi ra girtiye û dil nebûye..

11 İlân 1937'an da bî destûra S.Rıza, Dersimi jî welat derket û çû Sûriyê. Jî bo ku doza Kurdan bî cihanê bîde naskirin û hevalan jê ra çêke.

Ew kesên ku di 1925'an da, jî ber hukum bazzabûn û li Sûriyê ciwar bûbûn, dit wek Kamuran Celadet Beg, Dr.Ahmet Nafiz, Menduh Selim, Qedri Can û y.d.

Bî van hevalên xwe va jî bo ku qetliama Dersimê bî cihanê bidin naskirin, xebitin.

Dersimi, bangek derxist û şand Cemiyeta Yekitiya Milletan. Dî rojnameyêñ erebi û fransî da, bî maqalan, barbariya Türkân dani ber çav.

Hukumeta Türk, jî xebata Dersimi binteng bû, jî bo kuştina wi li planan geriya. Hukumeta Türk nehişt ku ew li Sûriyê reheti bîmine û kar bîke..

Dersimi, di Urdunê da kareki dibine û di 24.12.1938'an da tê wir. Hukumeta Türk li wir jî rîça Dersimi dajo û bî riyêñ resmi dixwaze ku Dersimi ji Urdunê bîde derxistin an ji teslim bigre.

Di 1939'an da ew nifûsa Sûriyê distine û li Helebê bî cih dibe. Lê hukumeta Türk, li vê derê ji pêşira wi bernade... Jî ber tesira hukumeta Türk, ew gelek caran surgun dibe û bê kar dimine. Lê Dersimi di nav vê rewşê da ji, xebata xwe sarnake. Lî dijî dijmin propagande û xebata xwe bî baweri tûj dike.

Dersimi welatparêzeki dilşewat û dilbirin bû. Di serhildana Koçgiri û Dersimê da cihê xwe girtiye û têkoşin daye. Dî şerê Koçgiriyyê da laweki xwe û di yê Dersimê da ji qizeke xwe qurban daye.

Tıştê giringtir ji ew e ku wi şopeke rind û miratek hêja jî ronakbir û welatparêzan ra hişt. Ewi belgeyêñ giranbuha jî dirokê ra diyari kiriye -xasîma derheqa Serhildana Koçgiri û Dersimê da... Ev berhemêni N.Dersimi, beşeki diroka gelê me ya wê demê roni dîke.

Jî bo xîlasbûna Kurdistanê, bî destê dijmin gelek kesên qehreman can dane û xwe jî bo welat fedâ kirine. Ew kesên ku xwedi jiyana nimûne ne nayêni jî bir kîrin û dîbin timsal di riya xebat, fedakari û welatperweri da.

Bîla şehidêni Kurdistanê di gora xwe da rehet razen. İro têkoşina Kurdistanê her diçe xurttir dibe û pêşeroj ya gelê me ye.

Welatparêzen me nemirin!..

DAXUYANI

Tevgera Rızgariya Kurdistan (TEVGER)

Hat damezrandin

Em, heşt hêzên şoreşger û welatperwer ên perçê Kurdistan'a bin destê Tirkîyê hatin cem hev û me **Tevgera Rızgariya Kurdistan** (bi navê kurti TEVGER) damezrand. Armanca me ew e ku em dawi lî işgala biyaniyan a ser welatê xwe ku bî sedsalan e dajo, lî nirê biyani yê ser hustuyê mîletê xwe û lî rejimê kedxuri yê gîran û zordariyê binin; lî Kurdistanê, dewletek serbixwe û demokratik damezrinin; cîvakê jî paşdemayina abori, cîvaki û kulturi xelaskin; têxin riya pêşveçûnê.

Dî roja iro de, lî Kurdistan'a ku jî bal çar dewletan hatiye perçekirin; hêzên serdest û kolonyalist, lî hember gelê me yê ku tu cari nîkarin hesret û evina wi ya jî bo azadiyê bitemirinin, şeriki qirkirinê dîmeşinin; hewl didin ku zîmanê me, kultur û tarixa me jî inkar bikin an bidin jîbirkirin.

Lê belê raya giştî ya cihani ji dizane ku gelê Kurd wek yek ji gelên kevnîtin ê Asya Nêzik û Mezopotamya tê naskirin û para wi dî avakırına medeniyetê çûyi yêndewlemend ên vê herêmê de heye. İşgala biyani ya ku jî sed salan ve ye dîdome, qirkirin, surgûn û zordariyê nediti jî bî gelê me neda stuxwarkirin, nîkaribû zîman û kultura me jî holê rake. Kurdistan'a ku iro dî navbera çar dewletan de hatiye perçekirin, xwedi 500.000 kilometir çargoşe erd e, nufusa gelê Kurd diğihîje 25 milyonan. Kurd wek ku hînek dixwazin nişan bîdin, ne "eqaliyet", mîleteki mezîn e. Gelê me ev du sed sal in ku jî bo azadiya xwe şer dîke û dî vê riyê de bî sed hezaran insanên xwe kîrîne bigori. İro jî lî temamên perçan, berxwedana netewi hê geştir û berfîrehtir e.

Gelê me qerardar e ku nirê netewi bîşkine. Em ji wek her geleki bî şeref, dixwazin azad bijin. Lî Kurdistan'a ku jî ali çavkaniyê sererd û binerd ve yek ji wan çend welatê dewlemend ên dînê ye, em dixwazin paşdemayıñê û xîzaniyê (belengaziyê) jî holê rakîn, em dixwazin cîvakeke gihaşti ya pêşketi deynin ku lêhatiyê (lî gor) çerxa me ya iroyin be. Em dixwazin abori û kultûra neteweyi pêşdexin, erd bîdin gundiyyê xwe, kar bîdin kîrékarêñ xwe. Em dixwazin ku mîletê Kurd bikin endameki jî familya mîletan a cihanê, yê xwedimafê wekhev û azad. Em dixwazin bî gelên dîn re dî nav aşîtiyê de, bî hevre û bî dostani bijin.

Dî vê demê de ku em xwe nêzi dâwiya qîrnê 20'an dîkin, tu hêz wê nîkaribe vê irade û daxwaza gelê me bîşkine. Eşkere dixuyê ku politika wan hêzên kolonyalist û zordar ku heta iro digotin qey dî riya rê û dîrbêñ zordarı û fîlbazi re wê karîbin gelê Kurd jî holê rakîn û jî mesela Kurd xelas bin, iflas kîriye. Gelek hewlek vala û beyhûde ye ku ew dixwazin çerxa dirokê berevacî bigerin. Ev politika tu netice na-de, jî bili ku tevi gelê Kurd eş û elemê bîde gelên herêmê yêndewlemend, hemû hêzên pêşverû, dîvî dî nav piştgîriyek xurt de bin, pêk ve, mil bî mil dîn.

Em bang lî hemû gelên herêmê, mirovêñ pêşverû, welatperwer û demokrat dîkin ku lî diji vê potitika zordarı ya çinêñ serdest ên kevneperek, xurttî rawestin. Jî bo ku mîlet qedera xwe bî serbesti bî destê xwe tayin bikin, jî bo aşiti, tevkari û pêşveçûnê, hemû gelên herêmê, hemû hêzên pêşverû, dîvî dî nav piştgîriyek xurt de bin, pêk ve, mil bî mil dîn.

Geli welatperwerên Kurdistanê! Geli insanên xiretkêş ên xelasiya welat dixwazin. Lî perçê Kurdistanâ bîn des-tê Tirkîyê, heta iro, hin gavênu ku jî bo yekitiya hêzên welatparêz hatin avê-tin, bî ser neketin-yan ji ta dawiyê ne-meşîyan. Lê belê ev nayê wê manê ku mirov têkeve bê hêvityê û xebata jî bo yekitiyê sist bîke. Jî bo biserxistin û ji-yandina yekitiyê, jî bo xurtkirin û gi-handina armanca wê divê em seri bî gelek karên zor re derxin. Lê belê çi qas zor dîbe bila bîbe, em mecbûr ìn vê yekê bî ser xin û emê bî serxin ji.

Dema bori ya dûr û dîrêj û bî êş a bîn nirê biyani û tecrubên têkoşina ku bî sed salan e tê meşandin, baş fêri me kîr ku jî bo şikandina hêzên kolon-yalist û jî bo rojekê zûtir xelaskirina gelê xwe, bîvînevê (mecburi) ye ku dî navbera hêzên welatperwer de yekitiyek berfîreh û tekûz bê pêkanin. Bir û baweriyêna cuda (cawaz) ên lî ser vê yan wê meselê, cudatiyêna programi (rêbazi) ne bend ìn û dîvê nebîn bend ku em dî bîn avahiyeke de bîghen hev, bî hev re jî bo armancêni müşterek şer bikin, rêxistinênu ku Tevger avakîrin, ji vê baweriyê bî rê ketin. Sefênu wê ve-kiriye jî hemû rêxistin re yên ku dixwazin jî bo armancêni müşterek ên hêzên welatperwer bî hev re xebat bikin û yên ku çi lazim be jî bo vê bikin. Em bangi wan rêxistin jî dikin ên ku jî vi ya jî wi sebebi besdari dewra ava-bûna yekitiyê nebûnu ku rojekê zûtir tevi wê bîbin, wê xurttir bikin. Sefênu Tevgerê, yeko yeko jî kesen Kurdistanî yên şoresger û welatperwer re ji vekiriye. İhtiyaciya têkoşina me bî alikariya her rêxistin û kesê welatperwer heye.

Em bang lî hemû rêxistin û kesen welatperwer dikin ku em bî hev re ci-yê xwe tê de bigrin, mil bidin wê. Pê-şinhukum (Pêşinqeneet), hissên qayışkêsiya rêxistinî, xirecira jî kevin de mayi, dîvê nebîn bend lî pêsiya yekitiyê.

Werin em bî hev re xebat bikin, jî bo rizgariya Kurdistanê hêzên xwe big-hinin hev! Rejima kolonyalist a Tirk.

hin iro ji dî wê politika xwe ya iflaskiri de israr dike; naxwaze hebûn û ma-fêñ gelê me nas bîke. Lî belê, lî hember têkoşina hêzên welatperwer a ku roj bî roj ges dibe, ew wê hin bêtir bê-care bîmine. Gelê me her çiqas zêrandaña(êşa) hewqas dijwar dit, hewqas insanên xwe bigori kir ji disa hustu lî zordaran xwar nekir û wê neke. Emê şer bikin û bî ser kevin ji. Dirok wê bî-be şahidê vê yekê! Berpirsiyare êş û elema ku tê kişandîn, ya xwina ku tê rijandîn û wê hin bê rijandîn ne gelê me yê ku dixwaze di aştiyê de bî ser-besti bîji, ew hêzên kolonyalist ìn ku jî bo berjewendiyêna xwe yên çavnebari vê politika zalim dîmeşine, berpirsiyar wê ew bîn.

Geli mirovên pêşverû û aştiywaz!
Rêxistinê demokratik û humaniter!

Dîvê hûn bêdeng neminin lî hember şerê xwini yê qırkırinê yê ku hêzên kolonyalist û zordar di çaryeka(çarika) dawi ya qırnê 20'an de, lî Kurdistanâ ku dî nav çend dewletan de hatiye perçekirin bî ordiyê modern ên bî hêz, bî teyare, tank û topan, bî çekêni kimyayı dîmeşine lî hember mîleteki mezîn ê ku dixwaze serbixwe bîji.

Tevgera Rizgariya Kurdistan, bang lî Rêxistina Miletêna Yekbûyi û sazû-manen pê ve girêdayî dike, bang lî welatêna demokratik û aştiywaz, partiyêna demokratik, rêxistinê ciwan û jinan û hemû kesen xiretkêş ên ku rûmetê didin aştiyê û azadiya kesen din ji, lî ronakbir û hunermendan dî... ku piştigiriya gelê Kurd bikin.

Ala Rizgari

KUK-SE Rizgarixwazên Netewi yên Kurdistan- Baskê Sosyalist

PARHÊZ- Partiya Hêza Welatparêz a Kurdistan

PDK-RN Partiya Demokrati Kurdistan
Rêxistina Netewi


PPKK Partiya Pêşeng a Karkeri Kurdistan

PSKT Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tirkîyê

ŞK Şoresgerên Kurdistan

YSK Yekitiya Sosyalist a Kurdistan

22 Heziran 1988



BAJAREKİ DİROKİ Ü HÊJA WINDA DIBE

HESKİF DI BIN AVÊ DA DIMİNE

BARAN

Hukumeta Tirkîyê nuha bî navê GAP plan û projeke mezin bî rêva dibe, li ser çemên Dicle û Ferat bend û barajên mezin ava dike. Bo hasilkırına elatirikê û avdanê. Bendên ku temam dîbin tê da av gol dîbe û gelek gund û bajarêñ Kurdistanê di bin avê da dimin û yekcar winda dîbin. Demek berê Samsat ku bajireki diroki bû dî bin avê da winda bû. Nuha dor hatiye Heskifê, bajarêki geleki kevn, diroki, hêja ku buhayê wê bî pere û pûl nayê hisabkîrîn.

Ji navbera çemên Dicle û Feratê ra Mezopotamia jor û navçe di nav sinorêñ Kurdistanâ berê û ya nuha da dimine. Axa vi welati wek zêrê zer e, bî xêr û bêr e. Bona vê yekê ye ku ew bûye warê bajarvaniyêñ heri kevn. Neh-deh hezar sal berê, weki tê zanin, di dînyayê da cara pêşin merivan li vir gund û bajar ava kîrine. Nivisan-dîn li vir kîş bûye.

Ev welat bî aliyê efrandin û bermayıyêñ diroki pir dewlemend e. Gelek gelên kevn, wek Hittit, Aşûr, Babil, Urartû, Med, Pers, Ermen, Rom, Ereb, Tirkhatine jê derbaz bûne, yan tê da ci û war bûne. Lê evder wek tê zanin, ta ji dema berê da welatê Kurdistan e. Bav û kalêñ me li vir jine û nuha ji dijin.


Gelên dim û Kurdan di demêñ xwe yên xurt da gelek bajar ava kîrine, qesr, kela, dêr û mizgeft, bendêñ avê, rê û pire çêkirin, bajarêñ xwe bî timsalan, bî sûret û şiklan, bî nîvis xemilandin. Lê tevi hatîn û çûna sedsalan dawiya gelek hukumdariyan hat, gelek bajar hilweşîyan, kambax bûn. Hînek bî destê İskit, Moqol û dagırkerêñ wek wan hatîn hilweşandin, şewitandin. Gelek bajar û efrandin dî bin axa nerm da man, kevintir bûn, lê ber xwe dan û heyâ iro hatim.

Efrandinêñ diroki xezneyêñ hêja ne bo gel û welatan. Xasima di dema me da hemû gel qimeta wan dizanîn, wan wek çavê xwe dîparêzin, yên bin axê dikolin û derdixin, yên zirarditi nûjen dikin. Lê li Kurdistanê ne bî vi awayi ye.

Dewleta Tirk li Kurdistanê heyiyêñ diroki yan dikisine dibe, yan ji di halê xwe da dihêle ku hilweşin, winda bin. Pir caran ji efrandinêñ derheqa çand û diroka Kurdan bî zaneti xirab dike, winda dike. Nuha ji bî dehan bend û barajên ku li ser Dicle û Feratê çêdibin, erdêñ fireh, warêñ diroki, bajarêñ hezar salan û efrandinêñ hêja, ango dirokeke hezar salan dî bin avê da dihêle, winda dike.

Ev tişt ne dî bira dewleta Tirk da ye. Ew li kara xwe digere.

Bendê (baraj) Gavanê (Geban) iro mezin-tirin bendê Tirkîyê ye û li Kurdistanê ser ava Feratê ye. Tu feydeke wi heyâ nuha ji Kurdis-



tanê ra ne bû. Elatrika wi derbazi Rojava (Tırkiye) dibe roni nade gund û bajarên Kurdistanê. Serda ji bî sedan gundên Kurdan, erdeki hêja, bî bereket, her usa ji gelek ci û warên diroki dî bin avê da man. Dawiya bend û din ji, şik tune, wê usa be. Lî Kurdistanê sanayi tune ku bi elatrika wan kar bike. Çi heye lî Rojava (Trkiyê) ye. Erdê ku bê avdan ji ne bo gundi cotkarên Kurd e. Dî rûbari wan benandan da bî hezaran gundên nu, gelek bajar dî bin avê da diminin, xelkê wan bar dikin dicin, lê hukumet axê lî gundiyên Kurd belav nake. Dixwaze ji derva xelkê bine lî vir bî ci bike. Her usa ji kesen dewlemend, Türk û biyani ji Kurdistanê erdê dikirin, xwe hazır dikin ku lî wêderê çitligan ava bikin. Ango erd û avdan ji disa bo sermiyandaran e.

* * *

Heskif lî ser Çemê Dicle, 110 km jêri Diyarbekrê ye. 85 km jêri Heskifê, lî ser ava Dicle bajarê Cizirê (Cizira Botan) heye. Her usa ji lî ser riya Sêrt û Mêrdinê ye.

Tırki jêra Hasankeyf dibêjin. Dî zmanê kevn da Hisn Keyfa, yan ji Hisn Kayfa "Hisn" dî Erebi da mana Kelayê ye. Mana "Keyfa" yê çiye, ne xuyan e. Dibe ku navê gel û welateki kevn e, yan navê hukum dareki ye, yan ji tişteki din e.

Mixareyên Heskifê bî nav û deng in. Dî dema berê da (dema kevirhaletan û dema antik da) dî van mixareyan da meriv jine. İro ji dijin ! Ev mixare him ji dema helanistik mane. Her usa ji, dî zinarêni Heskifê da gorêni keviri hene ku ji zemanê berê mane û giranbuhan ne.

Wexta berê riya ku hêla Tûr Abdin girêdi-da hêla Amedê (Diyarbekrê) dî Heskifê da Dicle derbaz dîkir. Ango bî aliyê çûnê û hatinê dî ciyekî geleki hêja da bû. Kela wê ku bî aliyê parastinê geleki baş bû, lî ser sinorê İmparatoriya Romê diji İranê demeke dirêj roleke mezin list. Wexteki lî vir maqarê piskoposiya Suryaniyan hebû. Dî bajêr da wê wextê gelek dêr hebûn.

Heskifê dî dema navçe da ji qimeta xwe ya leşkeri û stratejik parast. Pişti ku misilmani hate mintiqê, hukma Abbasiyân, pişti wê bî dor ya Hemdaniyan, Merwaniyan, Artûkan û Eyûbiyan lî Heskifê derbaz dibû. Heskif dî navbera 1101–1231, ango 130 sal bû payitex-tê Artûkiyan ku lî Amed û Heskifê hukum dîkirin. Dî sala 1931 da hukumdarê Eyûbiyan (xanedaneke Kurd) al-Malik al Kamil Heskif zeft kîr û hukma Artûkiyan lî wê gihande dwi. Dî sala 1260'i da Moxolan Heskif girtün, talan kîrin û şewitandin, zirarek gelek mezin dan.

Dî dema Navçe da Heskif zêtir pêşva çû. Gelek avayiyêñ nû çêbûn û bajar mezin û fireh bû. Lê dî sedsalên 15 û 16 da şunda ket. Him dî navbera şerê Osmani û İraniyan da zirar dit, him ji riya Diyarbekir û Cizirê guhari. Her usa pira mezin hilwei. Bajar her ku çû xirabe bû, piçük ket û bû wek gundeki. Lê avayiyêñ wê yêñ wê yêñ dema berê û yêñ dema navçe, hinek xirabûyi hinek ji hin lî ser xwe, heya iro hatîne û nişana mezinahiya wê ne.



HESKİF, Kumbeta Zeynel.

Kela wê li ser baxireki hatiye çêkîrm. Baxir 100 mêtro bilind e ji rûyê Diclê. Jî kelayê pagê quesreki, mizgeftek, ji bajêr ji çend mizgef-tên dinê mane ku hatine terkkîrm û hêdi hêdi xirabe bûne. Lî wi ali Diclê ji çend avayiyêñ kevn û türbe hene.

Çarali Kelê asê û bilnd e. Lî Kelê nerdivanek 200 ling hebû ku li ser zimar hatibû çêkîrin, heyâ Diclê dadiket. Ew ji bo anina avê bû wexta dijmin bo zeftkîrîna wê dor Kelê girt.

Lî bajêr, Mizgefta Rîzq heye ku di 1409 da Sultan Suleymanê Eyûbi daye çêkîrm. Mizgef hîlweşiyaye, lê minareya wê ya gelek xweşik, tiştek pê ne bûye, iro ji li ser pê ye.

Pira ser Diclê, xuya ye, avayiya heri mezin bû li bajêr û gelek bî nav û deng bû. Gerokên Ereb û Ewrûpi ku wê demê riya wan bî Heskifê ketiye, gotime ku li tu ci pireke usa mesin ne ditine.

Pir kingê hatiye çêkîrin kes nizane. Hîm pîspor û dirokzan dîbêjin ku di dema berê da hatiye çêkîrin. Dirokzan Gabriel ku li Heskifê demeki dîrêj maye û gelek lêkolaye, dî wê ra-yê da ye ku, ev pir di dema Merwaniyan (hukumdarêñ Kurd ku payitextê wan Farqin - carcaran ji Amed, ango Diyarbekir- bû) da ha-

tiye çêkîrin û ew bî gelek nişanêñ xwe efrandîneke dema navçeye. Sê kemberêñ pîrê hebû û dî kembera ortê da navbera lingêñ pîrê 40 mêtro dikışand ku wê demê ser wê ra tune bû. Dema iro ji kemberêñ usa fireh kêm in. Her usa, kingê hewce bibana, pîr dî ortê da ve-dibû, ango ji çûn û hatinê ra dihate girtin.

Pir kingê hîlweşiyaye, ew ji baş nayê zanîn. Lê gora ku Şerefxanê Bitlisi qaldike, heya dawiya sedsala 16 hin lî ser xwe bû. Piştî hîlweşîna kemberan ji lingêñ pîrê man.

Yek ji avayiyêñ kevn ku hin hîlneweşiyaye, Turba Zeynel e. Ew bî xweşikiya çinîyêñ xwe bî nav û deng e.

Ev bajarê antik, ji aliyê diroki va xwedi gelek dewlemendiyêñ din e, lê heyâ 2 - 3 salan wê li paş benda Ilisû, dî bin avê da bimine.

Prof. Oluş Arîk ku di Fakulteya Ziman, Dirok û Cografyayê da (lî Enquerê) dersê dide, nuha bo xilaskîrîna him efrandinan lî mintiqê kar û xebat dîke, dibêje ku: "Merkezîn hanê hezar salan da têñ meydanê. Heskif bî sedan sal dî vi halê xirabe da maye. Em hin nizanîn ku té da çi xezne hene û em wê nişkava winda dikin."

Gelek kesê zana û pîspor dîbêjin ku ev ben-dê avê ji Heskifê ne hêjatir e. Divê bajar neke-ve bin avê, bê parastîn û bibe muzeyek gran-buha. Bendê avê di 50 -100 sali da tiji dîbe û édi bî kêri tişteki nayê, lê bajarêñ usa kevn, efrandinêñ hezar salan cardin çenabin û şunda nayêñ.

Lê ne dî bira hukumeta Tîrda ye ku bajarêñ wek Samsat û Heskif dîkevin bin avê, xezneyêñ diroki ku têñ windakîrin.

Em Kurd ji, di rewşa bindestiyê da, ne xu-dan welatê xwe ne. Iro di bin zulm û zordesti-yeke nediti, ketîne derdê canê xwe. Me welat-ek winda kiriye, ne ku bajarek.. Lê disa ji, bi-bê nebê welatê me ye û rojekê helbet em ji xeleka bindestiyê wê bîşkinin. Divê iro ji he-yiyêñ welatê xwe ra xwedi derkevin, çığa ji dest hat wan biparêzin.

Xilaskîrîna dewlemendiyêñ diroki lî mintiqê iro gelek giring e. Divê em dinya alemê, xâsimâ sazgehêñ çandi wek UNESCO hîşyar bî-kin, lî ser bisekinin ku ew dî vi wari da hin kar û xebat bikin. Bajar bî temami xilas nebe ji, qe nebe hin efrandinêñ diroki ji çûna bin avê bîn xilaskîrîn.

TÊ BINI:

Aghdariyêñ derbari Heskifê da ji Ansiklopediya İslâmî hatine wergirtin.

çend çarin

BARAN

Dikê birci dî xewna xwe da ket ambara gêris
Dilketye reben xîlas bû ji derd û kulan dî saya wêris
Merivê şas û nezan bî hespa kulek dîkeve bezan
Xweli lî serê te, serokê te din, rêberê te bêhis
* * *

Şivanê Bom cehd dîke ji gisk şir bidoşe
Kera bom hewl dîde barê xelkê zû bîkêşe
Ji nav mîletan ji yê heri reben ew e ku
Dijmînê wi xurt û hisyar, serokê wi bêhis e
* * *

Xwezi xewneke mezin bîwa, ê te çirok e
Lawkê guri an ji Mehdi bê û te xîlas bîke..
Meriv be bîkeve rêzê, dest û piyê xwe bixebitîn
Azadiyê tucar ji guri û mîriyan hêvi meke
* * *


Bî serhişki çuyi, keti heri û hezazan, êdi dereng e
Riya xwe wînda kîr dî şeveke pûk û baran, êdi dereng e
Evdalo, te him mala xwe, him ya xelkê şewitand
Bom û bêhis i, ger ne bi ji, êdi dereng e
* * *

Ketiye cengê bî aqlê sıvîk barê gîran e
Cezayê serê gêj dîkşinîn lîngêن begune
Ger dîkari grêka mîjoyê xwe veke beri hemûyan
Destbendbûn hiç e, ya xîrabtîr aqîlbendbûn e
* * *

Dibê, "meriv ku kete behrê xwe davêje bextê mar"
Lê me ji te ra gotî bû, hevalo, "ew behr e, bîbe hisyar!"
Ka kê diye, mîletek bî destê dijmîn azad bûye?
Tu bom i, lê bomtîr in yêji te ra dibêjin serdar!

Tenê Welat Dıkare

Meriya Bextewarke



Ev gotina min dema gotübêjê devê binaci-yê gundê Arincê (navça Abovyanê, Komara Ermenistana Sovyet) Dawit Xloyan bîhist, yê ku bî saya çend sitiranêd xweyê bî zimanê Kurdi, ku dengxana (studio) Komita Ermenistanê ya elametiêd TV û radiyoya dewletê da têne xwedikirin û bî radiyoya Kurdi têne elamkirinê, gelê me ra eyane wek Davitê Xilo.

Her mirovek fikra sernvisara vê gotarê ra qayil e. Lê Davitê Xilo dubare vê fîkrê da bawer e, jî ber ku ewi zaroti û xortaniya xwe da li şaristana xeribi, neheqi, newekehevti ditiye. Jî kal - bavê xwe derheqa zulm û qetila Turki-

yayê bîhistiye, ku anine serê Ermeniya û wan miletêd mayin, ku dî wi welati da dîman. Simonê bavê wi hela xort bû, gava komêd Turkiyayê serkarikir sala 1915'a gelkujike sedsala 20'aye here bî xwin hindava bî sedhezaran Ermeniya miaser kır, wana hate xezebê. Gundê wan - Dêrik ji (wilayeta Bitlisê) kete bin derba nemama û bêbexta. Gund-gunditi rabûn dane ser rê-dirba, qe nîzanibûn bî kuda diçin, tenê derheqa wê yekê da difikirin, ku li ciki bê qeziya sitar bin. Mala Simon Xloyan çar sala ser wan riya zêriya, hate bawerkirinê, ku jiyana neferêd wi her dere bin qeziya giran da

na, sala 1918'a berê xwe dane İraqê, mentiqa Müsilê, gundê Mixareyê da hêwirin.

Derheqa wan sala da Davitê Xilo awa bir tine:

— Çawa ku dê-bavê min digotin, hilbet himberi Turkiyayê jiyanâ me İraqê da xweş bû; erdê me pir bû, me pez-dewar ji xwedi dikir. Lê hisreta weten timê dilê wan da bû. Ne axîr meri tenê bî têrxwarinê nikare xwe bextewar bihesibine. Tenê welatê meriya dikare meriya bextewarke. Em ne bawer bûn, ku emê li şaristanê rehet bijin, bixebitîn, bixwinin, ne eyan bû, ku roja me ye sîbê wê çawa be, ci wê bê serê me.

Dê-bavê Davit, Turkiyayê da nava Kurda da mezîn bûne, cinartike baş hevdu ra kiriye, rojêd oxirmê giran da pişta hev sekînine, hev pîrsine. Rast e, gundê wani Mixare li İraqê xurû gundê Ermeniya bû, le gelek cara di malê da Kurmancî dîpeyivin. Dayka wi bi sitaranê kurdi yêñ lûrikîrinê va bêşika (dergûşa) wi hejandiye, bi nazikayi ew hejandiye. Ü dengê sitaranê dayka wi ye xweş, aqlû kubra Kurdi tê qey bêji bi şirê dayikê ra tevayı ketiye na-va xwin û ruhê Davitê büyük. Ü çawa ku niha ew bir tine, gava ançax 3 - 4 sali bû û sazbendiya Kurdi dibihist, bê hemdi xwe pêra can di- bû, direqisi.

Sal buhurin, Davit mezîn bû, diha gelek sitaranê Kurdi hin bû. Ewi kîlamêd cihê-cihê distira, wê jîmarê da herweha sitaranê derheqa newekhevtiya cîvaki da, ku gel bi xwe sêwîrandibûn. Ü bavê guh dîda wan sitaranan, ke- sereke kûr radîhişt û digot: "Biktirê, kurê min, bistirê, rojek ji roja wê li ber me ji dergê xêrê vebe, emê ji ji qûltiya sala azabin."

Ü ew dergê xêr û xweşiyê sala 1946'a da vebû, gava gelek Ermeniyêd welatê derekê ew xebera xêrê bîhistin, ku welatê wana kal û ba-va hazır e wana qebûlke. Wê salê hemû 40 ma- lêd gundê wana minani meriveki (bi yek den- geki) bîyar dan ku herine welatê xwe Ermenistana Sovyetê. Xeyala wana ya bi sala, ku berê bona wana xewn bû, sala 1947'a hate se- ri. Bi sedan, hezaran Ermeniyêd welatê dereke payiza wê salê vegeriyane welatê xwe. Ü gava Simonê bavê Davit cara pêşin lingê xwe dani ser axa weten, ew ramûsa û got: "Şikir, em êdi li mala xwe nm."

Ermenistana Sovyet da ew bi dil qebûl ki- rin, mal, erd danê. Xebitin, bûne xwey mal- hal, kom-cinar. Li vira ji ciranêd wanaye Kurd hebûn. Derheqa dostiya van hardu mile- ta da Davit awa dibêje:

— Mala me sê welata da maye -Turkiyayê, İraqê û Sovyetistanê. Ü hersê welata da ji em di nava Kurda da mane. Ü timê me dosti û ci- nartike baş hevdu ra kiriye. Gava em teze ha- tibûne Ermenistanê û bavê min pê hesiya, ku Kurd kengê, çawa û çîma mihaciri vira bûne, fikreke wa got: "Serhatiya Kurdêd Sovyetista- nâ ji, bawer biki minani serhatiya me bûye. Wek Cegerxwinê mezîn gotiye, em birindarê şûrê ki ne?"

Ü rojekê ji Davit xwe riya para elametiyêd radyoya Kurdi li Yêrêvanê girt, hate ba serok û bingevanê radyoya Kurdi Xelilê Çaçan û bû dengbêjeki pêlweşeyi pêşin û hızkırı. Ew bi xwe sitaranâ nasêwirine, le sitaranêd usa disti- rê, ku temamiya cimetekê efrandiye û ew bi saya dengê xweyi xweş û hunermendiya qe- dandinê ya bilind zêñ û şureta xwe pêşkêşî gelê me dike.

Ewi dengê xwe bal tu pêşekzaneki hel ne kiriye, le li çiya û baniyêd Kurdistanê da hel kiriye, li ku diçû ber pez, li wan dera timê ras- ti Kurdan dihat, ji wana ji hini sitaranêd kurdi bûye. "Mamostayê" wiyi sazbendiyê gelê Kurd bûye, ku xwediyê sazbendiya dewle- mend e. Bilûra wi tunebû, le ewi bi dengê xweyi ziz gazi berxa dikir.

Niha gelek sitaranêd Davitê Xilo bi pêlweşâ Kurdi têne weşandin, wek "Roni", "Yar dilan", "Meli", "Ax hay hayê" û yêd mayin. Si- taranêd wi herweha bi pêlweşâ İraqê ye (li Bexdayê) Kurdi têne elamkîrnê, çend selik û kasetêd kîlamêd bi sitaranâ wi li Sovyetistanê, usa ji ji aliye çend organizasîonêd (teşkilat) Kurdaye li welatêd Awrûpeyê derketine.

Davitê Xilo idi teqaût bûye, bona xebata gelek sala bi resmi idi kar nake; le destê wi ji xebatê nabe. Çawa ew dibêje, du pêşekêd wi hene -necarti û dengbêji. Rast e, bîvê nevê rojekê ewê dest ji necartiyê bikişine, le serbi- lind e, ku pêşê duda -dengbêji- wê bi saya ra- dyoya Kurdi, bi sala, zemana, wek dibêjin, hetani kurê kura biji.

Têmûrê Xelil MÛRADOV
Endamê Yekitiya Rojnamevanêd Sovyetistan

JI DİROKA KURDISTANÊ

Jı Gernama EWLİYA ÇELEBİ

Derbari rewşa Kurdistanê ya sedala 17'a da, çavkaniya zaninê ya heri fireh û giring, gernama Ewliya ÇELEBİ ye.

Di vê sedsalê da, gerokê Türk Ewliya Çelebi (1611 – 1682) çend caran li Kurdistanê ji geriyaye. Kuda çûye û çı ditiye, çı bîhistiye, yek bî yek hertiş nivisiye; li ser xani û avayiyan, babetên siyasi û abori, evsane û çirokên nav xelkê, bûyeren diroki, şer û dozêni wi zemani, xwarin û vexwarina xelkê û hetta li ser ziman û devokên xelkê ji dûr û dirêj nivisiye.

Di Gernama (SEYAHATNAME) Ewliya Çelebi da, agahdariyên ser Kurdistanê, keriki mezin ê cildê IV 'an û beşike kurt ji cildê V 'an pêk tine.

Ewliya ÇELEBİ, cara pêşin di sala 1640'ı da diçe Erzorumê, li bakûrê Kurdistanê digere, paşê di ser Maku û Tebrizê ra derbasi Kafkasyayê dibe. Ü gera wi ya duwemin û heri dirêj di sala 1655 'an da destpê dike. Di vê gerê da ew li ser Kurdan û Kurdistanê geleki dinivise.

Em dixwazin van agahdariyan bere bere vegeerinine Kurdi û pêşkêşi xwendevanan bikin. Di hejmara çûyi da, me parçeki kurt—"Listika Çevganê"—weşandibû. Ji vir pêda ji emê vê yekê bi dominin. Di vê hejmarê da, emê şerekî navbera Kurdên Ezdi yên çiyayê SINCARÊ û Dewleta Osmani bidin ku niviskarê gernamê bî xwe ji li wê navçê bûye û bûye şahidê bûyeran.

Bêşik ew wek miroveki Dewleta Osmani I i bûyeran dinihêre. Ango ew li vir ne bêali ye...

Redaksiyona ROJA NÜ

CİROKA ŞEREKİ ÇİYAYÊ SINCARÊ

Werger: DILSOZ

Dema ku Mistefa Paşayê Fîrâr li quntara Kela Sîncarê bac berevdîkir û rîbiri dikir, li aliki Çiyayê Sîncarê ku bî navê Saçlıdax dîha te binavkirin, çiyayiyê har û dîjwar hebûn û dî nava wan çiyayiyan da 44 - 45 hezar Kurden Yêzidi û Babûriyên seperest, kafir, bêdin, bî por, civatek ku jî xiraban pêkhatibû hebûn û seri hildidan. Jî ber ku ewana bî qasi misqalek jî Serdar Mistefa Paşa nedîtisiyan û bî perû-yeck bîçük wi bî bir nedianin, Serdar gelek aciz dibe û li ber xwe dikeve.

Wê rojê Serdar Mistefa Paşayê Fîrâr dibêje:

— Ewliya Çelebi bîhistiye ku, gava bavê me Melek Ahmet Paşa li vê derê wek me bac dis-




tend û rîbiri dikir, van kafirê bî por û raperrinvan ji wan ra (M.A.Paşa û otorita wi ra) seri pêl nedikirin. M.A.Paşa gelek cara éris bir ser wan (Kurdên Yêzidi), her der kambax kîr û malê talanê bir. Ka hinek ji wan talanan bîde me, got û pirsa nûçeyen rasti kîr.

Min destbî çiroka xerib kîr, pêşanda:

— Maqûlê min, di sala da dema ku Melek Ahmet Paşa waliyê Diyarbekir bû ev Yêzi-diyên Çiyayê Sîncarê günden Mêrdinê talan dikirin, bazırgan, mîvan û rîwiyan dışelandın û rîbiri dikirin.

Pıştre hemû xelkên bajaran hatîn ba paşa-yê dîlpak û gili kîrin. Paşa, li pêşberi xelkê û dî diwana Diyarbekir da guh neda giliyên wan



BITLIS

*Dî temamiya
GERNAME da
Yek ji besen heri
balkes, nivisen
li ser Bitlisê û mirê
Bitlisê Evdal Xan e.
Hingê Bitlis li
hemû Kurdistanê,
dî warê çandi û
bajarvaniyê da
nawendeke giring
bûye.*

û giliyên wan qebûl nekir. Ewana ji, nifiran kîrin û bêyi ku daxwaziyên wan bî ci bê, zivirin bajarê Mêrdinê û gundên xwe.

Lê h ali dîn, ji bo ku jî van Kurdêñ bî por heyf bête stendin guft û goyên heyfê li her deri belav bû. Lê divê sir dî nava xwe da veşari bimine. Rojek M.A.Paşa nameyek bî gili û gotin ji Xanê Bitlisê ra dışine, Xanê Bitlisê ji, gelek aciz û hêrs dibe û nameyek nebaş dışine û tê da weha dibêje: "Çı ji destê Melek Ahmet Paşa tê bila texsir neke". Paşa dibe sotikeki agir, "Zû, emê bavêjin ser Xanê Bitlisê", dibêje, çadira xwe û Tûxên (alayên) xwe li hember Satê, li mintiqâ Sadikoy datine. Bî xulam û xizmetkarêñ xwe fermanan dışine eyaleta Kurdistan û eyaleta Wanê; roj bî roj wek derya esker dikîse Amida Reş (Diyarbekir).

Dî vê navberê da maqûlê me Melek Paşa, li bajarê Diyarbekir heftê ala Sekban (hêzek eskeri) û eskerêñ Sarica berev kir, ku her alayek ji sed mîrxasi pêk dihat û bî vi awayi sererast-kîrin qanûn bû, û divê hêzên Sarica peya, hêzên Sekban ji sıwari bûna. Her weha dî ordiya islamê da ji bajarê Diyarbekir û eyaleta Wanê bî jimare heştê û heft hezar çekdar û eskerêñ kemîlandi civiyan. Dema ku Paşa tevi sê hezar eskerêñ xwe bî ser Kela Mayafarqinê ra çû ser Xanê Bitlisê, ji ali Evdalxanê Bitlisê gelek mirovên bî rûmet wek Mela Mihemedê Hekariyê, Mela Cibrailê Zerbakiyê, Eli Axayê Motkê û Eli Axayê Konakdereyê, bî kurti heftê û sê kesen bî nav û deng, bî rûmet û xwedi keramet

ketin navbera Evdalxan û Melek Ahmet Paşa, ji bo ku wan li hev binin. Ev kesen han bî hedisan ketin pêşîya Paşa û heştê kisik pere, barê deh karwanê hêstiran qumaş, zirx, zêr, şeş tewle hespêñ kîhêl, deh keçen ciwan û deh koleyên xort ku wek şeran bûn dan.

Ü gelek xizmetkar û kesen bijare yêñ Paşa wisa hatîn perûkîrin ku, Xanê Bitlisê bî perûyan mirovên ordiya M.A.Paşa şa kir. Tev bî kîf: "Şikir em ji seferê xilas bûn" dîgotin. Bî vê kîfê ra wê şevê Paşa, ferманa paşvekişandinê da û dî eyni wexti da deh hezar esker da bin fermandariya kurê Şemsi Paşa-Mehmet Emin Paşa. Melek Ahmet Paşa devê xwe kir guhê M.Emin Paşa û bî selewatan hin teminiyêñ siri lê kir. Dî dawiyê da Paşa, jê ra got: "Here, Xwedê bî te ra be" û M.Emin Paşa berbi Diyarbekir verêkir. Lê tu kes ji vi axaftuna siri hayedar nebû. Hema wê gavê Gînai Efendi, ji Xanê Bitlisê ra nameyên dilxweşkîrinê dîmivisine. Dema ku Ahmed Axayê Erganiyê tevi name û aşitixwazên navbeyna Paşayê Osmaniyan û Xanê Bitlisê dîgîhêñ Bitlisê, tûxên M.A. Paşa ji, boriyan lêdixin bî paşva, bî heftê hezar esker va berê xwe dîdin Kela Diyarbekir. Gava M.A.Paşayê bî tedbir berê xwe dide Diyarbekir, "Bîla girani li dû min were" dibêje û Kadde Mehmet Kethuda û Recep Kethuda dîke serdarê eskeran û ew bî xwe ji, wê şevê dertê rê û buhurê Zerzivanê derbas dibe. Dotira rojê bî nivro ra dîghije binê Kela Mêrdinê û ji bo bindayinê çadıran dide vegirtin; dî eyni

wextê da êmên heywana tête dayin û paşi cardin bî rê dîkevin. Bî çika şefeqe ra tevi cil hezar esker dora Çiyayê bî poran (E.C, Saçlıdax) dîgrin. Paşiyê me dit ku, Mehmet Emin Paşayê ku qaşo berê xwe dabû Diyarbekir meger hatiye vê derê û çarmedora Çiyayê Bîporan (Saçlıdax) girtiye, ew û Kurdên Yêzidiyên har ku dî nava çiyayê asê da bûn, hevdu gullebaran dikin. Eskerên ku bî Paşa (M.A.Paşa) ra hatin, bî sibê ra xwe dî bin zinarê Çiyayê Sîncarê da veşartim û ketin kozikan. Hetta serhêzê me yê sereke Zîpir Bolukbaşı, serê sibê zû bî selewatan lî pêşberi hemû kesi tevi cil Sarica, wek mozeqirtikan Saçlıdax gullebaran kırın û ketin kozikan.

Lewra, dema ku sibeh roni bû, jî paşva wek derya esker kişiye deşta Sîncarê û Deşta Sîncarê bî çadıren büçük û mezîn xemili, bû wek baxçê laleyan. Heta sê rojan eskerên islamê ref bî ref kişiye Deşta Sîncarê û ev deşta han bî eskeran tiji bû û roj bî roj bûn bela lî serê kafirên bî por." Her weha, dema ku min rastiya babetê jî Mistefa Paşayê Firar ra got, şaş û metal ma û weha got:

— Canê min Ewliya Efendi! "Hûn çawa ketin wê derê û we çawa şer kır? We çawa jî vi çiyayê nalet xenimet stend û we çawa jî van Kurdên Yêzidi heyf stend û bî ser ketin? Kezeba min jî destê van şeytanê Yêzidiya qelişkiye, ku gelek caran fermanêni pirozi û name ji padışah ketiye destê min. Lî bêyi ku ez sir bîdim kesi, jî kûraya dilan min dixwest ku bî ser van porgijikan va bigrim. Dî dawiyê da min ji, Xanê Bitlisê jî xwe ra kır mane û bî deryayek esker berbi wê derê kitim rê. Lî wê derê gelek xwin rîjiya; me got qey emê gelek mal û xenimet bî xwe ra rakîn, heyfa şehidîn Kerbelayê û Hz.İmam Huseyin bîstînîn, serê Yêzidiyan bî şûrên tûj tiraş bikin; mal û xenimet, keç û xorîn ciwanêni kole bî xwe ra rakîn... her weha me cehd kır. Lî şikir, ku niha hêzên Paşa yê Sarica dor lî wê derê girtine. Lî canê min Ewliya Efendi, Melek Ahmet Paşa û we wê derê çawa bî dest xist, jî min ra nişande" got û rica kır.

Min disa pêşanda:

— Her weha bîla şayıya naskırı lê be ku, dî wi esrê da heftê alayêni Sekban û Saricayêni kemîlandi, deh hezar peyayêni Paşa hebûn û bî tevayı mîrxasen Abaza, Çerkez û Gurci bûn. Jî ber ku jî hevdu şerm dikîrin, tucar jî şer fikara nedikîrin. Ü bî namûsa Muhemed

dizanibûn. Hemû jî dîl û can dora Çiyayê Bîporan girtin. "Înşallah peydakarê eskerên Sarica Nasuh Paşa Efendiyê wezirê pirê me Sultan Ahmet, lî vi çiyayê Saçlıdax (çiyayê Şingal) heyfa bînketina me wê bîstine. Lî vi çiyayê heft hezar eskerên Sarica şehid ket, bî raya Xwedê emê heyfa xwina wan şehidîn xwe jî Yêzidiyan bîstînîn", gotin û hemû kesê ku dikarîbû çek ragire, bî sond, bî dîl û can ketin şer. Melek Ahmet Paşa efendiyê me bala xwe da ser meselê, lî ser sekini, dîlê hemû gaziyeñ islamê xweş kîr û bî hemû dîlpakiya xwe û sozê perûkîrinê, daxwaza şer di dîlê eskeran da bî ci kîr. Bî sibê ra jî heftê - heştê cihîn Saçlıdaxê (Şingal) wek ku bend bavêje felekê û berbi esman bîlind dibe derket çiyayê bîsîtûn. Jî aliki va jî, bî awazêni şerxwaziyê qewmê şeytan (Kurdên Yêzidi) û qewmê M. A.Paşa tam heft saet şer kîrin ku melekên esman, rûyê erdê jî şerê Melek Ahmet Paşa ratîlî gezkîrin. Dî vi şeri da hefsed mîrxas ketin erdê û qedeха mirinê vexwarin; jî Yêzidiyan ji hefsed kes mirin û kêm bûn.

Ser û qirkirinê heta roj çû ava domkir.. Jî ber ku êdi tari bî erdê ketibû, defêni rawestandinê lêket, herkes dî cihê xwe da bî haleki çekdar û jî şer ra amade ketin kozikêni bîlind, jî aliki va jî qereqol hatin danin û dî wi şeva tari da Kurdên Yêzidi jî bo dîziyê avêtin ser kozikêni gaziyeñ islamê, lê jî wan bî tevayı heftsed kes hatin kuştin, 75 kes jî bî can hatin dîlkîrin.

Dema ku sibe bû hemû gaziyeñ islamê kişiyan ser çiyayê Sîncarê û xwe berdan rezan, sîsesed gund kambax û talan kîrin lê jî ta û derzi bigre heta xwarin û vexwarin, heta bizmareki bî dest nexistin. Bî fermaña Paşa hemû xani hatin şewitandin; dûmâna reş yê xaniyeñ ku ser wan bî hesir girtibûn ghişt kûraya esman. Lî ew cûreyêni tiri yêni ku dî rezén wan da hebûn, Xwedê şahid e ku E. Çelebiyê feqîr dî gera xwe yê cil û yek sali da nedîtiye. Dev jî mehsûlê bî hezaran rezan, zadê deşta fireh berdan, ketin derdê canê xwe û şikeftên binê erdê jî xwe ra kîrin star ku her şikefteki nezi du hezar Kurdên Yêzidi dihewand. Tevi hemû malbatêni xwe, eşyayêni granbiha, xwarin û vexwarinê xwe ketin kûrayîyen binê erdê û şikeftan.

Lî gelek dil bî saxiti hatin girtin. Pişti ku jî nişkava M.Emin Paşa hat û ev çiyayê hanê

kır hesarê, dilan xeberê da ku wana (Yêzidiyan) teneyên xwe ji erdê ranekirine. Lê bê feyde bû, çil - pêncî hezar Kurdên çekdar yê melûn ketübûn şikeftan û ji kunan gullebaran dikirin, ji ber vê yekê ji, ne mumkun bû ku mirov xwe nêzi wan bike.

Gotina axurin ew bû ku, karê vi qewmê hanê dî şikeftan da, dî hesarê da mayin pêştir tiştek ninbû. Hetta Wezir Nasuh Paşa digot ku, dî dewra Sultan Ahmet da van melûnan, dî vi çiyayı da wisa qetliaman kırme ku hêj ji hestiyên Osmani lod bî lod lî meydanê bû. Ji ber ku Melek Ahmet Paşa Efendiyê me ji vê rewşa han hayedar bû, bî telaşa can hemû eskerên islamê ji beriya jêrin derbas kır û xwe gihande rezên ser Çiyayê Sincarê; ev rez û bexçeyên han tevi milkê wan zeft kır û xaniyên cûre cûre tê da ava kır û li wê derê bî ci bûn.

Ü temini li hemû eskerên islamê hate kırin, gelek caran bî sedhezaran destikên sole (sapê garîs û gulgulan) li ser devê şikeftan hate şewitandin. Sapên bî alav, meşkên sirke bî ser wan da hate rêtin; zinarên şikeftan ji ali hostayên xeşeb (matqab) û kolandinê hatin şikandîn, gelek cih hatin kunkirin. Dema ku ji van kunan sapên alavi hatin virvirandin. çi büçük û çi mezinên ku dî kûraya tunelên çiya û şikeftan da bûn dest bî hawar û fizarê kırin.

Ji Kela Mêrdinê bî deveyan şeş topêni bî erebe hate anîn û van topêni han li ber devê derê şikeftan, li deverên kîrhati hatin bî ci kırin. Jixwe derê şikeftan xitimandi bûn, ica bî derbê topan kambax dibûn û hemû melûnen navê qirdibûn. Hostayên kolandinê bî kulingan, bî hesin û xeşeban (Matkab) zinaran di-qewartin, ji wan kunan bombeyên destan yêne şûse (molotof-kokteyl) davêtin hundûre şikeftan. Her cara ku qumbere (bombe) rasti Yêzidiyan bî por dihat, wana parça parça dikir. Eskerên islamê û hostayên kolandinê, ji avênu ku ji bilindayiyan diherîkin ra rê vedan û berê avan dan birêñ şikeftan. Her şikeftêni ku bî avê tiji dibû, bî xwe ra mirovên şikeftê difetisand û yênu ku bî hewla can xwe davêtin dervayî şikeftê, disa bî avê û bî agirê alavi riya wan dihate birin û her weha Yêzidiyan ku dî şikeftan da bûn dihatin şewitandin, dihatin fetisan din. Qumberên şûse, wana parça parça dikir, gulleyên topan serê wan bî ser hevra gêr dikir û avêni çiya ji, wana difetisand.

Bî kurti, dî roja heftan da her yek ji wan bî hawar û fizar ji şikeftan derketin der û gaziyên islamê wek agirê Nemrût xwe berdan şikeftan. Dema ku eskerên islamê êrişi şikeftan kırin hin ji wan şehid ketin, hin jê ji gazi bûn, lê dî sala *** meha *** û dî roja *** da gaziyên islamê, Yêzidiyan bî por, ger bî şer ger bî hawar, kaş û berekaşê derva kırin û porê serê wan wek koçerên Selman qusandin. Gelek Yêzidi dema ku dilbûna malbat, jîn û zarokên xwe dîditin, hin ji wan çavêni xwe derdixistin, hin jê bî xenceran xwe dikuştin, bî hezaran kes ji bî hêrs êrişi dijiminê xwe dikirin û yan dikuştin yan ji dihatin kuştin. Gelek ji wan zarokên xwe bersing dikirin û xwe ji gelîyan da davêtin, parça parça dîbûn.

Gava eskerên islamê ev rewşa han dit, ew ji bî hemû qewetên xwe wana wisa dan ber şûran ku xwina wan Yêzidiyan ji zinaran heriki. İnşallah bî destê Melek Ahmet Paşa, heyfa xwina şehidên Kerbelayê hatiye stendim!

Bî kurti, deh roj û deh şev wisa şerekî mezinî çêbû ku şerê Ahmet Paşayê Bîçûk û şerê Çiyayê Durzi yê Maanoxlu weha nebûbû. Bî tevayı neh hezar seri û sêzde hezar û şeşsed jîn û mîrên Yêzidiyên raperîvan, keç û xort hatin dîkîrin. Ü eşyayên ziv û zér, malen giranbiha û wd. malen xenimetê hatin stendim ku bî gotinan, bî tesvir û xeberdanan nayen pesin dayin. Heft bapirêni wan hatin girtin (Bapir: ji şêx û serokên wan ra tê gotin). Hetta carek, dema ku serekê hêza Sarîca Zîpir Bolukbaşı bî halek westiyayı dî xew ra diçe, bapirek wan (Yêzidiyan) xwe ji zinciran xîlas dike û êrişi Zîpir Bolukbaşı dike, xencerê ji piştê dike û ji heft cihan birindar dike. Zîpir Bolukbaşı ji, bî hewla can xencerê ji destê bapirê melûn distine û hema wê gavê fersend nadê, bapir dikuje. Heta wê derecê Yêzidiyên melûn hene ku heta tu bêji mîrxas, bî jehri û bêturs in û hemû ev kafrîn han ji kelbê reş (segê reş) ra secde dîbin. Dî gundê wan da qet cami tune ye. Ü ji roji, nimêj, hec, zekat û kelima şehadetê bêpar in. Dî rezê wan da tiriyyen bî av heye û hemû meyxur in.

Bî gotina kurt, hemû eskerên ku ji eyaleta Wanê û Diyarbekir, ji kel û bajarêni Mêrdin û Diyarbekir hatin hawara Melek Ahmet Paşa, deh roj û deh şev mal û xenimet, ziv û zér, si far, xwarîn û vexwariman ji şikeftêni Çiyayê Sincarê kişandin. Xenimetên ku ji şikeftan

(Dûmahik rûp. 23)



KOMCIVINA KOMKAR'ê ya 10'an

Komcivina KOMKAR'ê (Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan Lî Elmanya Federal) ya 10'an, dî 25-26 Heziran 1988'an da lî bajarê Kolnê pêk hat.

Cawa tê zanin dî sala 1979'an da, bî avabûna KOMKAR'ê ra, dî diroka Kurdistanê da yekemin car Federasyoneke karkeran hat sazkîrîn. Jî roja damezrandîma xwe heta iro, KOMKAR bêwestan jî bo mafêñ karker û multeciyêñ Kurd lî Elmanya Federal xebiti. Lî aliyê din, ew lî dervayi welat bû dengê gelê Kurd, xwe bî dost û dijmînan da bîhistin. Zordesti û hovitiya dagirkérêñ Kurdistanê aşkere kîr, lî diji wan sekini. KOMKAR bî wextê ra bû nîmûneyeke baş jî bo xebata rêxistîni ya karker û multeciyêñ Kurd. Wê bî gelek xebatên curbecur, pirali xîzmeta ziman û çanda gelê Kurd kîr. Hêzên kolonyalist, jî xebat û kırinêñ KOMKAR'ê bî awaki ciddi aciz bûn. Xebata rêxistîni ya Kurdan bî vi

awayi, lî dervayi welat, jî kolonyalistan ra bû serêşîyeke mezin. Lema, xasma hukumeta Türk, jî bo sekinandîna xebatêñ KOMKAR'ê geleki cehd kîr. Zeman zeman jî hukumeta Elmanya ji alikari stend. Astengi derxîstîm pêşberi komel û komiteyêñ KOMKAR'ê. Lê zehmet-kêşen Kurd ên şoreşger, bî zaneyi û bî rîk xebata xwe domandin, lî ber dijwariyan destgirêdayi neman. Bêşik jî vir şunda jî xebat wê dombike, her biçe xurttir bîbe.

Komcivina KOMKAR'ê ya dehan carreki disa da xuyan, ku xebata tevayı xurtbûn e. Serkevtin û serfirazi bî xebata rêxistîni û şoreşgeri dîbe.

Dî sala xebatê ya 10'an da, em jî KOMKAR'ê ra serkevtinêñ nû, û rêxistîneke hin xurttir daxwaz dîkin.

Pêşeroj ya gelê me ye!
Biji azadi, bimre koleti!
Biji KOMKAR!

Mesaja İsmail BEŞİKÇİ


Ez di xebatê komcîvinê da ji KOMKAR'ê ra serkevtinan daxwaz dikim. Ji hemû hevalan ra silav û evinê xwe bî rê dikim. Bî vê wesilê, ez kîrhatî dîbinim ku van çend ramanê xwe bêjim.

Mistefa Kemal, dî civinekê da, ji endamên Sazgeha Tarixa Tîrk ra weha gotiye:

"Me erdê Balkanê çîma winda kir? Tenê yek sedemeki vêya heye. Ew ji avabûna sazgehêñ ziman in, ku ji aliyê sazgehêñ lêkolînê ên Slavi hatine sazkırın û dema wan sazgehêñ tarixa kesen di nav me da nivisandin û şuûra millî huşiyar kîrin, hingê em ji Balkanan hetani sînorê Trakyayê paşa vekîsiyan." (Enver Behnan Şapolyo, Komciwina ziman ya istisnai 1951, Ankara 1954, rûp: 54. Yê ku behs dike: Utkan Kocatürk, Atatürkün fikir ve düşünçeleri, Edebiyat Yayınevi, Ankara 1971, s: 165)

Pêwist e merîv bala xwe baş bîde ser fikir û ramanê Mistefa Kemal yên ku wi derbari ziman, çand, şuûra millî, dirok û hwd.da gotiye. Mesela derheq fikra jorin da, merîv dikare bigihije du encaman. Ya yekemin, derheq xebat û tedbirêñ wan milletan da ye ku naxwazin bîdest bijin.

Ew milletana pêwist e li zimanê xwe, li diroka edebiyat û çanda xwe xwedi derkevin. Mistefa Kemal, piştî da-



mezrandına Komarê (Cumhuriyet), pêvajoyeke (process) weha daye destpêkirin. Elfabeya Tîrkî ya nûh hatiye sazkırın, sazgehêñ lêkolînê wek Sazgeha Zîmanê Tîrkî, Sazgeha Diroka Tîrk hatine avakîrin. Di zaningehan da ji bo lêkolînê destbî xebatê kîrine. Bî siyaseta wan a perwerdegariyê û çandê nîşenê ciwan, di vê meylê da hatîne gîhandin.

Lê belê ji wan gotinan, merîv dikare enameke din ji derxe. Ew ji ev e: Eger dixwazi milleteki di bîn bandora netewi da bîhêli, eger, di welateki da berdewam kîrina kolonyalizmê ji

bo te pir gîring be, hingê divê tu wi milleti bê elfabe bîhêli. Divê tu pêşketina zimanê wi, edebiyata wi, lêkolina tarixa wi milleti qedexe biki. Tê rê li ber bigri ku ew gel negihije şuûra netewi. Çimki eger bigihije şuûra netewi, hingê wê bixwaze tarixa xwe, jiyana xwe biji, hukmê te nasnake û wê li diji te rabe.

Aha, bî avabûna Komarê ra, qedexekirina zimanê Kurdi, astengiyêñ li ber zimanê Kurdi, edebiyata Kurdi, gerek e di nav vê çarçovê da bête hêjandin (qimetkîrin). Bî rasti rûyê din ê vê siyaseta han, ku nêziki 70 salan e bî zaneyi û bî rîk tê ajotin, dide xuyan ku ew bûye astengi, da ku Kurd negihijin şuûra netewi, hîşiyarbûna netewi dereng bikeve. Ji bo vê ji çi qedexe hene, hatîne fîkrandin û bikaranin. Ji bo ku tu rêç û şopek ji zimanê Kurdi, edebiyata Kurdi, tarixa Kurdi nemine, wan her tiş

kiriye. Nedayina destûra navê Kurdi ji zaro-kêñ Kurdan ra, guherandina navê gund û herêman, ji van tiştan te-nê çend nimûne ne...

Serwerêñ dewlet û hukumeta Tîrk, derbari Tîrkan da, bî şewq û kîfxweşî behsa armanca siyaseta xwe ya perwerdegari û kulturê dikin. Hemû weşan, radio, TV, sinema û hwd. di vi wari da têñ xebitandin. Siyaseta xwe ya derbari Kurdan da ji, her bî wi şêweyi, bî rîk û

zaneyi dîdominin. Lê tu wextekê ev armanca na yêñ aşkere kîrin, tenê fiilêñ têñ kîrin. Mesela, ew tu wexteki programeke weha aşke-re nakin: "Ji bo qedexekirina zimanê Kurdi, her cûre tedbir wê bête stendin." Weha nabêjin, lê armanca siyaseta perwerdegari û kulturê ya ku tê ajotin, di wê tûşê da ye, da ku zimanê Kurdi bête tunekirin.

Gelo fîkrêñ Mistefa Kemal li ser ziman, dirok, serxwebûna netewi, perwerdegari û kulturê û pêkanina van fîkran, ji bo Kurdan çi ifade dike? Vejendin, lêkolina vê babetê, gerek ji

Kurdan ra bibe wezifeyeke giring. Pêwist e hevrikiyên (dijayeti) navbera gotinan û rewşa praktikê, bî balkêji li ber çavan bête raxistin. Tıştên ku hatine gotin, ji aliyê Türkân va û ji aliyê Kurdan va çi ifade dike, pêwist e cuda cuda bêñ tehqiçkîrîn. Dîvê astengi û qedexe bêñ pêpezkîrîn. Lî vir hêza heri mezîn, bêşik ilm e. Ilm dîvê hertim bikarîbe ideolojiya fer-mi rexne bike. Kê hewceyi ilmê ne, ew wê dî-afrînin. Kurd geleki hewceyi ilmê ne.

Dî vi wari da, ez bî ked û xebata KOMKAR' ê, û çawa ew di ser astengi û qedexeyan ra gav dike, ji nêzva hayedar im. Ez van xebatê han bî serbilindi bîbir tinim.

Dî vi wari da, ez ji xebata KOMKAR'ê ra serkevtin û serfiraziyê daxwaz dikim.

Disa ji hemû hevalan ra silav û evin.

Ankara, 14 Heziran 1988



NAVÊ AZİZ NESİN Jİ KETE LISTA "PARVEKARAN"

Beri çend mehan niviskarê mizah ê bî nav û deng Aziz Nesin, siyasetvan M.Ali Aybar û roj-namevan Fatma Yazıcı ji ber beyanên xwe ketin ber topa dewleta Türk a fasist. Gelo wana Tîrkiyê firotibûn, li ser hesabê welatek din cassûsi kırıbûn, insanan kuştıbûn..., ku ewqas bî hêrs û lez dawe li wan hatîbû vekîrin? Çi kırıbûn ku ji 7 heta 15 sal ceza ji wan ra dihate xwestin?

Wana "gunehkariyek" pir mezîn kırıbûn! Lewra dî beyanên xwe da hebûna Kurdan û mafêñ wan ên "çandi" parastıbûn. Ne zêde ne ji kêm!..

Beyana Aziz Nesin: "Dî çarçeva welatek yekpare da, dîvê hebûna gelê Kurd, zimanê wi yê cihê û çanda wi wek rastiyeyeke ilmi bête qebûlkîrîn, qanûnê heyi li gor van rastiyân bête guhartin. Dîvê gelê Kurd bigihê mafêñ xwe

yê çandi (kulturi).

Herweha beyanên M.Ali Aybar û Fatma Yazıcı ji, dî vê çarçevê da ye.

Mehkeme berdewam dike û çıqas diçe dawe girantrî dibe. Dî mehkema dawi da raporeki wisa balkêş hate pêşandan ku Aziz Nesin, li pêşberi Mehkema Parastin a Dewletê (DGM) yeki ji xwe hostatır pêşanda û hostatiya wi bî van gotinan qebûl kir: "Dîlpaki ne pêwist e. Ez dî çapa dinê da, dî warê mizahê (pêkenin) da bî nav û deng im. Lî bî rasti tîşteki weha nedihat bira min ji."

Ew kesê ku ji Aziz Nesin ji hostatır bû û bî mizaha xwe, bibuhurin bî "rapor" a xwe Aziz Nesin şaş û metal dihişt ki bû û çî kırıbû dî careki da nav û deng dabû. De niha em guh bîdim çirokê:

Berya 12'ê İlônê serbazek (sûbay), ji Qur-

maya Gıştı (Daire Eskeri ya heri bîlind) ya Tirkîyê ra raporek derheqa Kurdan da hazır dike. Ev serbazê han pîr "bî aql" û "tarixzan" bûye. Lewra dî derheqa Kurdan da wîsa tişteki kîfş kiriye, ku ditmîn wi bûye siyaseta fermi ya dewleta Tirkîyê. Qurmaya Gıştı, serbazên qurmay li Tirkîyê belav dike û bî vi ditîna "nû" tarixa Kurdan weha dike nasandin: "Dema ku Türkmenen Rojhilatê Tirkîyê (Doxû) pêli berfa ku binê wi şîl, ser wi hîşk kîrine, ji binê piyêñ wan dengê "KART.. KURT.." derketiye. Herweha ji ber vê dengê han navê KURD peyda bûye û ji Türkmenen Rojhilat ra gotine KURD."

Aziz Nesin, ev çiroka han bî bira hakim û sawciyêñ DGM'ê tine û weha dibêje:

"Her weha ji bo ku ez, ji wan 'Türkmen'êñ ku li ser berfê dengê KART.. KURT.. derdi-xin ra dibêjim KURD, ji bo ku ez mafêñ wan ên çandi diparêzim, li pêşberi we wek sûcda têm mehkemekirin".

Piştre Aziz Nesin aşkera dike ku, "mehkeme ji ali sawciyê Stenbolê nehatiye vekirin, ew ji ali Weziriya Daxili va hatiye vekirin!." û li ser vê babetê gotna xwe weha didomine: "Eger dî derheqa me da dawe nehatibûya vekirin, ew çax wê tenê çend hezar kes bî vê rastiyê bîhi-siya. Lî bî vê mehkema han wê her kes pê bi-hise". "Ezê dî duwerojê da iddia mehkema we û parastina xwe wek pirtûk biweşinim".

Nesin, "Bî ser ma da gul nayê avêtin. 10-15 sal hebsa me tê xwestin. Sawci, daxwaziya perwerdegariyek dervayi zimanê fermi wek propaganda qebûl dike û dixwaze ceza bide min. Lî gelek derê Tirkîyê bi zimanê biyani perwerdegari tê kîrin. Ew çax eywax li hemû Tirkîyê hisêñ netewi qels dibe. Eger tenê Kur-di hisêñ netewi qels dike, ew çax bila qanûnêñ heyi li gor vê rastiyê bê guhartîn". "Dema ku min got, 'bila hebûna çanda gelê Kurd bête naskîrin, perwerdegari bête kîrin, min negot bila zimanê fermi ne Tirkî be. Pirsgrêka Kurd tabû ye û rastiyekê ilmi ye. Rastiyêñ ilmi bi qedexeyan nayêñ veşartın. Dwê em bi hevra vê tabûyê ji holê rakin. Lewra ev rasti-ya civaki qalikê xwe derizandiye".

Nesin, gotna xwe weha kuta dike: "Wextê min ê tursê derbas bûye. Ez rûsîpîkirina xwe ji naxwazim. Vaye welat, vaye sawci, vaye ez, vane Kurd û hûn. Hûn çawa dixwazin, wîsa bi-kin".

Her weha dewleta kolonyalist, nijadperestîya xwe bî hemû awayan didomine. Dev ji kur-mê xwe yê berê bernade, ji rêçîka pêşiyêñ xwe dernayê. Bî hemû rûreşî û reziliyan raziye lê ji qebûlkirina Gelê Kurd ra ne razi ye. Ew ketiye avzêleki wîsa ku, lî kijan ali xwe dîlivîne hînek din ji newqi avzêlê dîbe. Her weha êdi xîlasiya wi ji avzêlê tune, lewra êdi ji navê berjor hatiye daqurtandin.



(Dûmahika rûpelê 19'an)

Ji Gernama
EWLİYA ÇELEBİ

hatîn kişandîn, ji deryayê dilopek, ji tavê ji zerreyek ninbû. Her weha Yêzidi, heta vê de-reçê dewlemend û zengin bûn. Lewra ji bûyera Kerbelayê vîrda ewana dixwarîn û vedixwarîn; û dî navbera wan û tu milûkeki da bûyerek çê-nebûbû, tu tişteki wan nehatibû rexnekirin.

Gotna dawi ew e ku Melek Ahmet Paşa, 1060 tûr mal, 11 kis xelekên zêr, 3000 tifin-gîn cûre cûre, 300 bar ipekêñ rengin, bî sedan barêñ barûda reş, 300 hêstir, 1800 keç û xor-

têñ ciwanêñ dil û bê hesab qumaşen bê emsal bî dest xist û ji dehan yekê van xenimetan wek zekata Sultan jê ra ma. Xenimetêñ ku para mir û maqûlan, kesen li ser kar û gaziyêñ musliman ra ket, bê hed û hesab bû û hed û he-sabê malê Firavûnan her Xwedê dizanibû.

Dî her kon û şikefti da pênc - deh mîr û jîn û dil hebû. Pez, dewar û gamêşen wan tune bû, lê hêstir û bizinêñ wan gelek bûn.

KINCÊN SPORÊ

YÊN SÊ-RENG

2

VAZGAL

İro serê sibê esker û polêz girtine ser otêlê, mirovek û nexweşeki wi ku ji Mêrdinê hatibûn hil dane birine. İro ji yeki bi êşkence kuştine, li ser vê yekê hatm hemû mirovên ku li otêlê dixebeitin ji pırsiyaran derbaskırın, lema ez derengi mam. Tu caran dest ji me Kurdan nakşinin.

DAYIK

: (Hêrsa xwe li Eyşê tîne) Ewana ji bi emran dikin, nanê wan jê tê. Tu çîma dupeyivi, ewêñ girti birayê te ne, bavê te ne?

EYŞE

: (Geziyê ji dest datine erdê, serê xwe radike li diya xwe dînhêre, bi dengeki nermik) Ça ji min ra çi? Ewana ji Kurd in û wek me xizan in, serda ji rebenê ne xweş bû, aqlê min qet nabire ku ew mirovan ji tiştek ne rê çêkirine. Usa ne çîma êşkence kîrin û kuştin? (Disa dengê xwe nîzm dike) Yadê, ez gori! binhêre bavê min ji, ji me dûr e, li Stenbolê ne mir ne ji dixebite. Tiştek weha binine serê bavê min tê çi bêji? Heya iro me tu bîhist ku lawê dewlemend an axaki birne kuştine? na xêr tenê belengazên wek me dîbin kut-seqet dihêlin an ji dikujin...

DAYIK

: Erê, erê! disa destpê meke...

MUXBİR

DAYIK

MUXBİR

EYŞE

MUXBİR

EYŞE

(Deri tê kutan û yeki bi qirawat (qılıtk) serê xwe dirêji odê dike. Bêyi ku kes bibêje "keremke" dikeve hundir, bi Türkiyeki Stenboli xeber dide).

: Kolay gelsin teyze (Çavê xwe li malê zûtirki digerine, li Eyşê dînhêre, Eyşê serê xwe lê dîghuje, geziyê hildîde disa malê paqîj dike), (Seyrê ji cida radibe)

: Buyîr Cemal efendi. Bu mal seba we mağula degil, lô disa buyîr.

: Yok teyze tüccarlar kulübûne gidiyordum bir uğrayayım dedim. (Disa li Eyşê mîze dike) Ayşe senin için iyi bir iş bulacağım, yarın bana ugра.

: (Bi Türkiyeki baş) Sağol ben işimden memnunum.

: Ugra pişman olmazsin (Bi pici dikene) Hem bu günlerde Kürtçülere dikkat et seni de yoldan çıkarmasınlar. (Aliyê deri diçe, vedigere disa çavê xwe li malê digerine û derdikeve der.)

: Caşê kurê caşa, bi aqlê xwe wê min bitîrsine û bixapine. (Bê dengi deri tê kutan, xort û keçek serên xwe ji deri dirêji hundir dîkin, keçik dikeve odê, bi serê xwe silav li wan dike)

KEÇIK	: Xwişka Eyşê! Omer li mal ni-ne?		daynîn an ji bê kaxîz ji me bîgrin bîbin.
EYŞÊ	: Na, hûnê çi bîkin?		: (<i>Rojnama dirandi davêje aliye û dîpeyive</i>) Na, naaa, ne wiло ye. Kaxîz li mal nebinim tu kesi bî zorê nabîn. (<i>Serapê di nav toz û xubarê da Omer dîkeve hundır</i>)
KEÇIK	: Îşev wê ser Baxlera bîgrin, me go em we agahdar bîkin.		: Merheba xatiya Neriman, çawa yi? Jî Evdo tu xeber heye?
DAYİK	: (<i>Bî çavek hêrs û kin li wan din-hêre</i>) Tiştek me yê vesarti, dizi tune ye. Lêxin herin!..		: Çi xeber hebe Omer! Cara çûyi em çûne ziyaretê, nehiştin em hev bîbinin. Usa tê xuyan ku disa himber van segbavan xwe birçi dîhêlin, nan naxwin.
EYŞÊ	: (<i>Dîkeve mabeyna wan</i>) Sîpas, hûn zêde ji li diya min nenhîrin.		: Min ji bihist, disa li zindanê da eşkence destpêkiriye.
XORT	: Hewce ye ez bo alikariya we li vîra bîminim? (<i>Seyrê destê xwe, wek "lêxin bîcîhîmin bîçin, dî-hejîne</i>), (<i>Xort bî destê xwe gazi keçikê dîke</i>) Em bîçin, de xatirê we. (<i>Herdu ji odê derdikevin, dîçin</i>).		
	(<i>Lî derva teqe reqa piyan e, kuça wana gelek deng têن. Seyrê dîce ber pencerê, derva mîze dîke, vedigere ji Eyşê dipirse.</i>)		
DAYİK	: Omer li kijan cehenemê ma? Dibe ku tiştek hate seri?		: Kingê bîrine ku, disa destpêkin
EYŞÊ	: (<i>Ew ji meraq dîke lê nişani diya xwe nade</i>) Meraqa meke, ki dizane li kijan kuçê li pey holê dibeze. (<i>Jî aliyeji quncikêni malê mîze dîke, li ciki kaxizek dîbine, dixwine û didirine. Seyrê dîbine, ji dest digre li koşa odê dîşewitine</i> .)		: Dema wana nehiştin tu Evdo bîbini, we çi kir?
DAYİK	: Hûn ji ketîne nav vi şîxuli, hûnê serê me bixine nav xaxê giran. (<i>Wê gavê Neriman bî lez dîkeve odê</i>)		: Pêşiyê em ji eskeran tîrsîyan. Paşê jînek ji nav me qiriya, got: "Kurê min li hundır dîkujin, bîhêlin ez lawê xwe bîbinim" û xwe avite aliye deri ku bîkeve hundır. Esker bî kundaxê tîvîngan lêxîstîn, wê çaxê em tev qiriyan û me deng da hev. Bî eskeran va pevçûn. Lê hin esr hebûn tev nedibûn û heq didane me.
NERİMAM	: Jî nuha va seyê xwe yên sivil şandîne mehella me. Îşev diyare dor yê me ye. (<i>Nêzikê Eyşê dîbe, dizika qise dîke, bî dest û serê xwe nava malê nişan dîde. Seyrê ketîye nav malê kaxîz digere û rojnameyek rojane ê ser-miyandaran dîbine -Hurriyet- ji hêrsan didirine</i>) Seyrê! ji wana tu bela nayê serê me, jê netîrse, ewana yên wana nîn.		: Jî we tu kesi girtin?
DAYİK	: Tu kaxîz êdi naxwazîm bîkeve mala min. (<i>Herduyan dînhêre</i>)		: Xwastin lê em bî hevra himber wana sekîn, ewana ji paşê ji me qerin. (<i>Heta wi çaxi Seyrê guh dîde, dema Neriman dîsekîne ew bî meraq dipirse.</i>)
EYŞÊ	: Bî pürtük û rojname şewitandinê tu kes xîlas nabe yadê. Ewana bixwazîn, kaxizek dîkarîn		: Paşê çi bû?
			(<i>Her sê ji dizvirin aliye Seyrê</i>)
			: (<i>Bî ken</i>) Paşê em tev bî aliye qolorduyê va meşîyan, li ber derê wana me disa bî hevra qisekir. Zabîtek derket gote me: "Hûn herin ezê bîpîrsim çîka çi bûye, çi qewîmiye? Carek dim hûn dîkarîn mirovîn xwe bîbinin".
			: Her tim usa dibêjm, lê derewan dikin.
			: Belê rast e, em ji dizanîn, lê ji destê me çi tê? Piştre ji Seyran-tepe heta bajêr em tev hatîn û dîrê da qiriyan, derheqa eşkence û xwebirçîhiştîna girtîyan da me millet agahdar kir.

BANGA NAVNETEWİ JI BO PARASTINA ÇANDA KURDİ LI TIRKİYÊ

Di 29'ê Heziranê 1988'an da êlanek Enstiuya Kurd Li Fransa, hate belavkirin. Ev êlan bi armanca "serbestkîrîna zimanê Kurdi, rakîrîna qedexeyan li ser çanda gelê Kurd, bi ci anina mafêñ demokratik û insani" hate weşandin. Bi vê êlanê ra kampanyayek navnetewi hatiye vekirin û ji niha va bi hezaran kesen navdar û sazi bi imzayên xwe besdari vê kampanyê bûne, wek serokwezir, wezir, parlementer, diplomat, siyasetvan, hunermend, niviskar, rojnamevan, curbecur sazi û w.d... Bi kurtti kampanya, li seranseri dinê piştgiri dibine û roj bi roj firehtir dibe. Di destpêkê da kampanya, tevi navê 430 imzaavêj hate weşandin. Ji van imzaavêjan : 5 wezir, 216 parlementer, 15 wezirêñ kevn, 24 kesen ku xwedi Xelata Nobelê ne, niviskar, zanyar, rojnamevan, hunermend û w.d.

Ev banga han û lista navê besdarêñ kampanyayê, di 29 Heziran 1988'an da di rojnama LE MONDE (Fransa) û li Emrika di rojnama

INTERNATIONAL HERALD TRIBUNE da hate weşandin. Wek tê zanin, ev rojnamen han di dinê da têñ naskirin û di van rojnamen da bi firehi weşandina vê kampanyayê, balkêşî û giringiya kampanyayê dide xuyakirin. Bêşik ev kampanya bala dewleta dagirker ya Tirkiyê û gelek rojnamen Trkiyê ji kişand. 30'ê Hezirana 1988'an da Hurriyet: "Kampanyayek kustah", Tercuman: "Kampanya imzayê ya parvekaran", Sabah: "Parvekar li her derê cihanê imza berevdikin" û hwd. nijadperestiyâ xwe nişan dan û ji exlaqê insani û rojnamevani dûr tewreki nişan dan.

Li gor agahdariyê, ev kampanyaya han bi munasebeta qedexekirina zimanê Kurdi li Tirkiyê (3.3.1924), hatiye vekirin û armanca wi di dawiya êlanê da weha hatiye xuyakirin: "Heta gelê Kurd negihê mafêñ xwe yêñ çandi wê ev kampanya berdewam bike".

Em, li jêrê lista besdarêñ kampanyayê ya bi inglizi didin.

Wek hemû civakêñ insanın, gelê Kurd ji xwedi mafê parastin û pêşandana mirata xwe ya çandi û şexsiyeta xwe ye. Çanda gelê Kurd digihê kûraya hezar salan û ew beşek ji çanda cihani ye. Tarixa vê çanda han, berhema sedsalan, berhema nifşen insaniyetê ye û wek hemû çandan (kulturan) layiqê rûmet û parastinê ye. Jî ber vê yekê ye ku, ev şexsiyeten ku li jêr imzayên wan hene, di reberriya Peymana Koma Milletan, Daxuyaniya Cihani ya Heqê Mirovati û peymanen navnetewi yêñ derheqa mafêñ mirovi da, li diji hemû cûre neheqiyân radiwestin û ji rêvebirêñ dewleta Türk, serbestkîrîna zimanê Kurdi û rakîrîna qedexeyen ser çanda gelê Kurd da-xwaz dikin.

INTERNATIONAL APPEAL IN DEFENSE OF KURDISH CULTURE IN TURKEY

Like every human community, the Kurdish people have the right to preserve their cultural heritage and to freely express their identity. The Kurds' ancient culture is part of the world's cultural patrimony. The product of centuries of history, the work of generations, it deserves, like all other cultures, respect and protection. That is why the undersigned, guided by the principles proclaimed in the United Nations Charter, the Universal Declaration of Human Rights and the international covenants on human rights, opposed to all forms of intolerance and discrimination, concerned with justice and democracy, urge the Turkish authorities to abolish all constitutional and legal bans on the use of the Kurdish language and, more generally, on all cultural expressions of the millions of Kurdish citizens of Turkey.

PRIX NOBEL

Christian BANFINSEN, USA ; Kenneth J. ARROW, USA ; Herbert C. BROWN, USA ; Herbert A. HAUPTMAN, USA ; François JACOB, France ; Sir John KENDREW, Grande Bretagne ; Jean-Marie LEHN, France ; Salvador E. LURIA, USA ; André LWOFF, France ; Mairead Corrigan MAGUIRE, Irlande ; Louis NEEL, France ; Adolfo PERES ESQUITVEL, Argentine ; J.C. POLANYI, Canada ; Ilya PRIGOGINE, Belgique ; Carlo RUBBIA, Italie ; Claude SIMON, France ; Desmond TUTU, Afrique du Sud ; S. VANDER MEER, Pays-Bas ; George WALKER, USA ; Elie WIESEL, USA.

ARTISTES

Nestor ALMENDROS, Argentine ; BARBARA, France ; Maurice BEJART, France ; Ingmar BERGMAN, Suède ; Jane BIRKIN, Grande Bretagne ; Juan CEDRON, Argentine ; Gérard DEPARDIEU, France ; Miguel Angel ESTRELLA, Argentine ; France GALL, France ; Francis GIROD, France ; Roger HANIN, France ; HIGELIN, France ; Malak-Djahan KHAZAI, Iran ; Parviz KIMIAVI, Iran ; Catherine LARA, France ; Ariane MOUCHEKINE, France ; Yves MONTAND, France ; Hugo SANTIAGO, Argentine ; Euore SCOLA, Italie ; Mrinal SEN, Inde ; Fernando SOLANAS, Argentine ; Bertrand TAVERNIER, France ; Frères TAVIANI, Italie ; Gian Maria VOLONTE, Italie.

ECRIVAINS ET JOURNALISTES

Rodney ATCHLEY, Grande Bretagne ; Hani AL-FIKAIKI, Iraq ; Kadim AL-SAMAWI, Iraq ; Rafael ALBERTI, Espagne ; Jorge AMADO, Brésil ; Giancarlo ANGELONI, Italie ; Père Ernesto BALDUCCI, Italie ; Salim BARAKAT, Syrie ; Ruben BAREIRO-SAGUIER, Paraguay ; Caroline BEHR, Grande Bretagne ; Marshall BERMAN, USA ; Jean BERTOLINO, France ; Claude BOURDET, France ; Robert BRECHON, secrétaire du Pen Club français ; Gérard CHALIAND, France ; Didier DECORN, France ; Régine DESFORGES, France ; Margre DRABBLE, Grande Bretagne ; Umberto ECO, Italie ; Salim FAKHRY, Iraq ; Jean-Pierre FAYE, France ; Michel FLEURET, France ; Lady Antonia FRAZER, présidente du Pen Club britannique ; Marisa GIOFFRE, USA ; Victoria GLENDINING, Grande Bretagne ; André GLUCKSMANN, France ; Alan GUINSBourg, USA ; Nora GUTTMAN, USA ; HAJI-SEYED-DJAVADI, Iran ; Marek HALTER, France ; Michael HOLROYD, Grande Bretagne ; Bernard LAN-GLOIS, France ; Claude LANZMANN, France ; Penelope LIVELY, Grande Bretagne ; Joyce LUSSU, Italie ; M. MAHOOBI, Iran ; Eduardo MANET, Cuba ; Claude MAURIAC, France ; Emily Arnold McCULLY, USA ; Arthur MILLER, USA ; Juliette MINCES, France ; Alberto MORAVIA, Italie ; Abdul-Rahman MUNIF, Arabie Saoudite ; Jan MYRDAL, Suède ; Esmaïl NOORIALA, Iran ; Manuel Zapata OLIVELLA, Colombie ; Juan Carlos ONETTI, Uruguay ; Grace PALEY, USA ; Octavio PAZ, Mexique ; Gilles PERRAULT, France ; Harold PINTER, Grande Bretagne ; Augusto ROA-BASTOS, Paraguay ; Bernice Ruth RUBENS, Grande Bretagne ; Severo SARDUY, Cuba ; Tom STOPPARD, Grande Bretagne ; René TAVERNIER, vice-président international du Pen Club ; Hélène TOURNAIRE, France ; Kathryn WATTERSON, USA ; Linda WOLFE, USA ; Sa'di YOUSSEF, Iraq.


UNIVERSITAIRES

Samuele Sabino ACQUAVIVA, Université de Padoue, Italie ; Richard ADAMS, Université du Texas, USA ; Jalal Sadiq AL-ADM, Université de Damas, Syrie ; Hadi AL-ALAWI, historien, Iraq ; Michel BANKS, London School of Economics ; Hanna BATATU, Georgetown University, USA ; Cyril BELSHAY, Université de British Columbia, Canada ; M. BENCHIKH, Université d'Alger ; Terry CANNON, Thames Polytechnic, Grande Bretagne ; Gustave CHOQUET, membre de l'Académie des Sciences, France ; Claude COHEN-TANNOUDJI, professeur au Collège de France ; Harvey COX, Université de Harvard, USA ; Vincent CRAPANZANO, Université de Columbia, USA ; Stanley DIAMOND, New School for Social Research de New York, USA ; Lion EISENBERG, Harvard Medical School, USA ; Didar FAWZY, historienne, Egypte ; Rodenick FLOUD, Birkbeck College, Grande Bretagne ; René GALLISSOT, Université de Paris ; Burhan GHALIOUN, sociologue, Syrie ; Myriam GOHEEN, Université de Harvard, USA ; Mabdi HAFIZ, économiste, Syrie ; Fred HALLIDAY, London School of Economics ; David HAMLYN, Birkbeck College, Grande Bretagne ; Mohammed HARBI, historien, Algérie ; Hans-Georg HEINRICH, Autriche ; Guy HERAUD, Université de Pau, France ; Paul HIRST, Birkbeck College, Grande Bretagne ; Mark HOFFMAN, London School of Economics ; François HOUTART, Université Catholique de Louvain, Belgique ; Deell HYMES, Université de Virginia, USA ; Edmond JOUVE, Université de Paris, France ; Edgar LEDERER, Membre de l'Institut ; Linda MAYOUX, Cambridge, Grande Bretagne ; Pierre METGE, chercheur, France ; Alexandre MINKOVSKY, professeur honoraire à l'Université René Descartes, France ; Maxime MOLYNEUX, Exeter University ; Théodore MONOD, membre de l'Institut, France ; Lucia MORA, Université de Castilla-La Mancha, Espagne ; Kichiro NAKAHARA, Université de Tokai, Japon ; Andrei NICOLAI, professeur ; Michel ORIOL, professeur, France ; Roger OWEN, professeur, Grande Bretagne ; Nasser PAKDAMAN, Paris VII, France ; Antonio PAPISCA, Université de Padoue, Italie ; Gérard PIERRE-CHARLES, sociologue, Haïti ; Maxime RODINSON, Ecole pratique des Hautes Etudes, France ; Julio RODRIGUEZ-PUERTO-LAS, Université autonome de Madrid, Espagne ; Laurent SCHWARTZ, mathématicien, France ; Léon SCHWARTZENBERG, cancérologue, Faculté de Médecine de Paris, France ; William A. SHACK, Université de Californie, USA ; Michael M.J. SISCHEK, Université de Huston, USA ; N. SMITH, vice-doyen de Harvard Law School, USA ; Paul Patrick STREETEN, directeur du World Development Institute, USA ; Eugenio SUAREZ-GALBON, Université de Madrid, Espagne ; L.V. THOMAS, la Sorbonne, France ; Germaine TILLION, sociologue, France ; Alain TOURNAINE, sociologue, France ; Amando URIBE, professeur, Chili ; Peter UTTING, Essex University ; Carmen VERGARA, Université de Madrid, Espagne ; Pierre VIDAL-NAQUET, historien, France ; Paul VIEILLE, sociologue, CNRS, France ; Richard VOKES, Kent University, Grande Bretagne ; Kazuo YAMAUCHI, Université de Tokai, Japon ; Sami ZUBaida, Birkbeck College, Grande Bretagne.

AINSI QUE :

Gianfranco BARTOLINI, président du Gouvernement régional de Toscane, Italie ; Baroness Tessa BLACKSTONE ; Alberto BRASCA, président de la Province de Florence, Italie ; Bernard DORIN, ambassadeur de France ; Jacques GAILLOT, Evêque d'Evreux, France ; Luciano GUERZONI, président de la région Emilia-Romagna, Italie ; Dr Silvius MAGNAGO, président du Sud-Tyrol, président du SVP, Italie ; S. PATJIN, gouverneur de La Haye, Pays-Bas ; Alfonsina RINALDI, maire de Modena, Italie ; Antoine SANGUINETTI, amiral, France ; Philippe TEXIER, magistrat, France ; Dr Luis ZINGERLE, président de la région du Trentin, Sud-Tyrol, Italie.

CETTE CAMPAGNE D'OPINION SE POURSUIVRA JUSQU'A CE QUE LES DROITS CULTURELS
DES KURDES SOIENT RECONNUS. ADRESSER SIGNATURES ET SOUTIEN FINANCIER A :
INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS. TÉL. 48 24 64 64.



TOLSTOY

Wergerandin ji Türkî: X. LEZGIN

ÇİVİK Ü HECHECK

Ez li eywanê rûniştibûm, min li hêlinê hecheckan ya li binê sivingê dînihêri. Min dit herdu hecheck, li dû hev ji hêlinê derketin friyan û çûn. Hêlina wana vala ma.

Pışti ku ewana çûn, ji ser banê çivîkek bi telaş û heyecan baskên xwe çîrpand û hate xwarê, li ser hêlina hecheckê dani. Lî der û dora xwe nihêri. Disa baskên xwe bi çalaki çîrpand û xwe berda hundirê hêlinê. Pışti qaseki serê xwe ji hêlinê derxist derva çik çik çik destbi xwendinê kîr.

Dî sera pir derbas nebû, ji hecheckan yek şûnda vege riya. Kîr ku bîkeve hêlinâ xwe, nihêri û mîvanê nevexwendi dit. Bî dengeki bîlind, heta jê hat, destpê kîr kire qije-vij. Baskên xwe dîçîrpand û dî ciyê xwe da mina hêlekaneki dihejand. Paşê firiya û ji wir dûrket.

Lê çivik hêj dî hêlinê da bû û dîxwend: çik çivik, çik çivik.

Paşê refek hecheck müşkava lî pêşîya hêlinê xuya kîr. Te dîgot belki hatîne û dîbêjin ka hela em çivikê bibinîn. Paşê çawa hatîbûn wîsa ji fîriyan û çûn.

Mina ku ev yeka han ji çivikê ra qet ne xem bû. Serê xwe lî vi ali wi ali dîzivrand û çik, çik, çik dîxwend.

Hecheck disa hatîn, nîzam, tiştek bî hêlinê kîrin, fîriyan û çûn.

Weha çûyin û hatîna wan bê sedem ne bû helbet: Her yek ji wan, dî nav nîkulân da piçek çamûr dîhatîn û dîhatîn, gîşkan bî hevra hêdi hêdi devê hêlinê dîxitimandin.

Dîfîriyan û dîçûn, disa dîhatîn, her car devê hêlinê bêtir dîhûnandin, dîgirtin teng dîkîrin û teng dîkîrin.

Pêşiyê serê çivikê ji derva xuya dîkir. Paşê êdi tenê nîkulê wê xuya dîkir. Dawiya dawiyê tu tişteki wê nedr-xuya êdi. Çivik dî nav wi diwarê hûnandi da mabû.

Hecheckan ji dîkîrin qije-vij û li dora xani dîzivrin.

KEVIRÊ GIRANBIHA

Rojeki gundiye khevireki giranbiha
dibine. Ez çi bıkım? xwe bı xwe difikir-
re. hildide dibe ba mir.

Xwe dîgihine koşkê, ji dergevanan
dîpirse ka ew çawa dikare mir bibine.

Yek ji dergevanan dixwest bizanibe
gelo gundi çira dixwaze mir bibine.
Gundi jêra rasti eşkere got. Hingê der-
gevan:

—Pir baş e, ezê te bibim cem mir. Lê
bî şerteki: Mir çı bide te nivê wê tê
bidi min, soz? got.

Gundi ev peyman qebûl kîr, da pey
dergevan û çûn. Mir ev kevîrê giranbihâ
gurt û pîrsî:


— Bedêla vi keviri tu çı ji min dixwazi ez bîdime te?

Gundi:

— Pênci şemaqı lı min xın, perûya ku
ez jı we dıxwazım gışk ev e. Lê digel wi
dergevanê 'ku ez anim cem we, peyma-
neke me heye: Her çı perûyê ku hûn bî-
dine min gerek e ez û ew lı hev parve-
kin. Lema jı wan pênci şemeqan bist û
pênc şemaq para wi ye, dıvê lı wi xın,
got.

Mir bî vê yekê geleki dilxwêş bû. ya-digarêñ hêja da gundi û dergevan ji jî iş avêt.

XACEPIRS





BIHA: 10:- kr.